

## Perwerdehiya bi zimanê dayikê

Dengê yekemîn ku mirov dibihîze dengê dayikê ye. Ew deng vediguhere lorîk, dia û evînê; zarok bi wî dengî dikene, bi wî dengî digirî û bi wî dengî ji jiyanê fêm dike. Ji ber vê yekê, zimanê dayikê ne tenê amûrekî axaftinê, lê koka herî kûr... ***Arslan Ozdemîr/R.5***



## Nameya Lalik

Ev ne name ye. Ne gazin û lome jî. Di xewnereşkek de me niha û bi tiliyên hesretê xêzik mêzikan çêdikim. Belkî gur bibînin û bitirsin û çeqel bixwînin û ji kerban bimrin. Vî welatê kambax ne zaroktî hişt ne mezintî, ne bihar hişt ne payîz... ***Mizgîn Ronak/R.2***



## Pîvanên qonaxa pozîtîf çi ne?

Divê Veguherîna Civakî û Sazûmaniya Dewletê ji nû ve bê nîqaşkirin û li gorî berjewendiyên civakê bê avakirin. Her wiha sazîbûna sîstemeke nenavendî ku rêveberiya herêmî ya ku li gorî rastiya pêkhatiyên herêmê nas dike bê avakirin... ***Felemez Ulug/R.6***


*10 - 16 Mijdar 2025*
*Hejmar:* 308
*Buha:* 20 TL
rojnameyaxwebun@gmail.com

# xwebûn

xwenasîn e




## Barbara Dêrsimî

Mîyanê polîtîkaya tenkîlî de cayê Dêrsimî "cîya" yo. Dewlete vera Dêrsimî metodê şerê taybetî vi-raştêne. Çike no dem Dêrsim de hişmendîya azadîye xeylê berz bîye. Kemalîstan nêwaştêne ke na hişmendîye Kurdîstan de vila bibo û kirmancî azad bibê. Înan waştêne ke kirmancî hertim "way û bira" bibê. Cewherê na wayûbirayîye de "bendeyîye" est bîye. Tebîî dêrsimijan no ferzkerdiş qebûl nêkerdêne. Dewlete waştêne Dêrsimî bi temamî tasfiye bikero. Na çarçewa de sîyasetmedaran û fermandaran xeylêk raporî nuştî û derheqê tasfiyekerdişî de metodê cîya-cîyayî pêşnîyaz kerdî. Tayênan vat dêrsimijî bêrê qirkerdene, tayênan vat ziwan û kulturê înan bêro asîlîmekerdene û tayênan vat Dêrsim de xebatê awanîye bêrê viraştene. Netîce de îdareyê kemalîstan qerarê Dêrsimî da û serra 1937 de dest pê qirkerdişî kerd.... ***R.9***

# Jin bajaran ji nû ve sazdikin

Lijneya Rêveberiya Xwecihî ya DEM Partiyê Amed, Nisebîn, Cizîr, Artemêt û Gever wek bajarên jinan îlan kir. Hevşaredara Bajarê Mezin a Wanê û hevseroka GABBê Neslîhan Şedal der barê armanca îlankirina van bajaran de axivî: "Watedayîna jiyanê di şexsê jinan de çêbûye. Têkiliya jinan a bi civakê xwezayê û kesan re têkiliyek demokratîk e. Serdestî, bindestî û hiyerarşî di nav civaka exlaqî û polîtîk de tune ye. Jin û zilam di nav vê civakê de wateyê didin hevdu û hevdu temam dikin. Bi vê nêzîkbûnê jiyan watedartir dibe. Di rêveberiyê de her kesek xwedî gotin e. Lê mixabin piştî hişmendiya zayendperet hatiye avakirin, li gor xwe û hişmendiya xwe bajar ava kirine. Ev bajar jî çanda zilamtiyê diafirînin. Bajar bi hişmendiya zilamtiyê ve tên birêvebirin. Di nav wan bajaran de ji bo jinan û ji bo kesên ku hez bikin li gorî pîvanên exlaqî û polîtîk bijîn, cih tune ye. Tekiliya jinan a bi civakê re, ya bi jiyanê re û bi taybetî ya bi zilaman re hatiye qutkirin. Bi avakirina van bajaran û qirkirina jinan, ya xwezayê, ya civakê û di heman demê de ya jiyanê dest pê kiriye. Li hemberî vê jiyana bêwate divê ku bajar dîsa bi aqil, ruh û nêrîna jinan bên avakirin... ***Hevpeyvîna Medya Bal/R.4***



## Hesasiyeta pêvajoyê

Tevgera Azadiyê gavên xwe yên dawî avêtin. Li ser daxwaza Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan biryara xwevekişîna ji Tirkiyeyê ji raya giştî ragihand. Biryarê li cîhanê gelek deng veda. Piştî daxuyaniyê bi taybet li Enqereyê di siyasetê de liv û tevgêrek berbiçav pêk hat. Daxuyanî li ser daxuyaniyê hatin dayîn. Di serî de sazî û dezgeyên demokratîk, kesayetên xuyayî û tevahiya raya giştî ya aştîxwaz ji bo ku dewleta tirk gavên şênber bavêje bang li hikumeta AKP-MHPê kirin. Li gorî van geşedanan mirov dikare bêje ku êdî gavên yekalî yên ji hêla birêz Ocalan û tevgêra wî ve bêne avêtin nemane. Ango ji bo pêşîvekirina li pêvajoyê, aliyê kurd tişta ji destê... ***Serdar Altan/R.6***

## 2 îmzeyên veşarî


Li gorî ku tê gotin, Receb Erdogan li gel DYAyê du caran peymanên bi dizî/veşarî îmze kirine! Berî destwerdana Iraqê Buch, Receb Erdogan ji 'zindanê' derxist, kişand Washingtonê û mîna serokkomar li ser xalîçeyên sor ew pêşwazî kir. Hat gotin ku wê wextê, bi şewazeke veşarî, ji bo êrişî Iraqê bikin û desthilatiya Seddam birûxînin, peymanek îmze kirine; ev, îmzeya yekê ye. Erê, her çend weke ku dixwestin pêk nehat jî, lê dîsa jî Receb Erdogan çi ji destê wî hat destek da DYAyê, ji bo destwerdan û rûxandina rejîma Seddam. Sedemên pêknehatina desteka DYAyê, ji ber ku projeyek wan a lezgîn derket pêş ji bo rûxandina Seddam, lewma têra xwe... ***Ahmet Aktaş/R.8***

## 'Komun xweparastina bingehîn e'



Endama TJAyê Xecê Oncu der barê aştiyê û rola komunan de wiha axivî: "Em wek Tevgera Jinên Azad dibêjin, aştî ne tenê bêdengbûna çekan e. Em aştiyê wek bidawîbûna hemû cureyên tundiyê dibînin û pênase dikin. Aştî tê wateya jiyaneke wiha ku jin lê neyên kuştin û nasnameya wan neyên înkarkirin û bedenên wan nebin qada şer. Ji ber van sedemên ku me dane diyarkirin, em ê têkoşîna xwe ya ji bo aştî û civaka demokratîk a komunal mezin bikin. Di vê xetê de wek xweparastin jî me komunan destnîşan kir. Jixwe komun xweparastina herî bingehîn e... ***R.2***

# Entegrasyon ne asîmîlasyon e



Entegrasyona Demokratîk, zimanê aştiyê yê vê dem û wextê ye. Hedefa wê ew ku kurd bên nasîn û tevlîbûnê bi pêvajoya demokratîkbûna Tirkiyeyê re bike yek. Bi kurt û kurmancî, entegrasyona demokratîk ew e ku gel bêyî ku hebûna xwe deyne aliyekî, dibe parçeyek birûmet yê yekîtiyekê. Wateya wê ji bo kurdan jî ev e: ne bi veqetîn û cihêbûnê lê bi nasname, çand û zimanê xwe bi pêkhayetên din re, li ser zemîneke adil û wekhev înşakirina jiyanê. Lê entegrasyona demokratîk tenê daxwazeke civakî jî nîne. Her wiha ew bangeke ji bo ramaneke nû ye jî. Mîmarê vê fikrê jî rêber Apo ye. Rêber Apo entegrasyona demokratîk yek ji têgînên esasî yên 'Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk' pênase kir. Li gorî ku ew pêşniyaz dike, entegrasyon nayê wê wateyê ku civak bi dewletê re bibe yek. Naxêr, ew dibêje ku bi civaka demokratîk wê komara demokratîk bê avakirin. Ji bo fêmkirina vê jî divê em biçin hevdîtina 28ê tebaxê ya heyeta DEM Partî ya Îmraliyê ku bi rêber Apo re kir. Hingê rêber Apo got; hêza avakar a entegrasyonê civaka demokratîk e. Di modela rêber Apo de civak pasîf û tebatî nîne. Di nav lebat û tevgerê... ***Ramazan Olçen/R.7***

## Dizê zeytunan kî ne?

Komên paramîlîter ên girêdayî Tirkiyeyê li Efrînê darên zeytûnan ên welatiyan talan dikin. Komên paramîlîter di cotmehê de, zêdetirî hezar darên zeytûnan birîn û bi sedan çewal zeytûn dizîn. Komên paralîmîter her tim bi talankirin, wêrankirin, revandin, kuştin û diziyê dikevin rojevê. Bi taybetî li Efrînê hem welatiyan direvînin û hem jî mal û milkên welatiyên Efrînê talan û wêran dikin. Li gorî daneyên Rêxistina Mafên Mirovan li bajarokê Bilbilê yê Efrînê 150 darên zeytûnan talan kirin û şikandin. Demek beriya wê zêdetirî 900 darên zeytûnê yên Efrînê hatine dizîn. Nûneran anîn ziman ku li gundewarê Efrînê derdora 150 kîsên zeytûnan ên welatiyan û 500 çewalên welatiyekî din dizîn... ***R.3***

## Dildarê gelê xwe afirînerê 'Ey Reqîb'

Hin helbestvan û nivîskarên neteweyî hene ku bi helbestên xwe di nav dilê gelê xwe de textekî zêrîn çêdikin ji bo xwe. Ew helbest her tim li ser zimanan e û hestên neteweyî bilind dike. Lê belê hin ji wan jî hene ku hestên wan dibin sirûda neteweyekê. Helbestvan Yûnûs Raûf jî yek ji wan e ku hem cihê xwe û hem jî hestên xwe di nav gelê kurd de tacîdar kirine. Raûf jî wekî gelek nivîskarên kurd navekî kurdî yê "Dildar" li xwe dike û bi vî navî hatiye nasîn. Dildar, piştî Şerê Cîhanî yê Yekemîn, 20ê sibata 1918an, li bajarê Koysancakê yê başûrê Kurdistanê ji dayik bûye. Beriya şerê cîhanî malbata Dildar rewşa wan a aborî gelek baş bûye, lê ji ber rewşa pergala leşkerî û kar bi... ***Rohat Bulut/R.11***

# ‘Komun xweparastina herî bingehîn e’

**Aktîvîsta TJAyê Xecê Oncu der barê deklerasyona TJAyê ya 25ê Mijdarê got: “Em ê 25ê Mijdarê ne tenê wek helwesteke li dijî tundiyê, em ê bi dirûşmeya Jin Jiyan Azadî û jiyana komunal pêşwazî bikin.”**

Xecê şen



Tevgera Jinên Azad (TJA), 3yê mijdarê, ji bo 25ê Mijdarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinan a Navneteweyî bi dirûşma ‘Bi Civaka Demokratîk Ber bi Jiyana Azad a Bê Tundî ve’ deklerasyon da.

Em derbarê deklerasyona ku hat dayîn û plansaziya TJAyê bi aktîvîsta TJAyê Xecê Oncu re axivîn.

Xecê Oncu di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser têkoşîna ku Xwişkên Mîrabell dane û heta îro tê meşandin û ev tiştê anî ziman: “Tundiya li ser jinan îdeolojîk e. Bi rastî jî bi hezaran sal in dîroka jinan û hebûna jinan, çand û baweriya jinan tune tê hesibandin. Her sal li seranserê cîhanê herî kêm 80 hezar jin bi tundiya meran re rûbirû dimînin û tên kuştin. Pergala modernîteya kapîtalîst ji bo ku xwe li ser lingan bihêle li hember jinan şerekî vekirî dide meşandin. Bi her awayî û di her kêliya jiyanê de dixwaze jinan ji jiyanê qut bike. Ji bo vê yekê jî li dijî jinan şerê derûnî, aborî, çandî, siyasî û civakî dide meşandin. Zagonên ku dewletên mêrane dane çêkirin mînaka herî şênber e. Her çiqas zagonên ku vêga hene îdia bikin ku mafên jinan diparêzin jî, lê li pratîkê ne wiha ye. Zagon mêrên kujer diparêze û wan bi polîtîkayên bêcezakirinê serbest berdide. Me di deklerasyona xwe de behsa pêşnûmeya pakêta 11emîn a darazê ya ji bo pêşkêşkirina meclisê hat kirin jî bi berfireh kir. Pêşniyarên rêziknameyên giran ên cudakar dihewîne. Em dikarin bibêjin ku ev pêşniyar mafê jiyana azad a takekesî tehdîd dikin. Bi vî awayî pirensîbên wekhevî û parastinê yên di metnên zagonan de cih digirin li pişt serweriya hişmendiya mêran dimînin.”

**‘Xweparastina herî bingehîn ne’**

Xecê Oncu li ser jinên ku ji aliyên unîformayên dewletê ve hatin kuştin, zarokên ku bûne qurbana polîtîkayên şerê taybet ên dewletê û wek alternatîf jî xweparastina bingehîn komun dest nîşan kir û wiha axaftina xwe berdewam kir: “Wek ku hemû cîhan jî dizane em hê jî aqûbeta Gulistan Doku dipirsin, em hê jî diqirîn ka çi bi Rojbîn Kabaîşê bû, em dîsa jî dibêjin em kuştina Narîn Guranê qebûl nakin ku di tariyê de bê hiştin. Ji ber ku Narîn bûye sembola vê pergalê. Lewra di vê pergalê de mafê zarokan jî bi awayekî pergalî tê binpêkirin. Tundî, kuştin, tacîz, tecawiz, bê perwerdehî hiştin, xizanî û tundiya derûnî hwd. Polîtîkayên bêcezakirinê bûne yek. Em wek Tevgera Jinên Azad dîsa dibêjin, aştî ne tenê bêdengbûna çekan e, lê wek bidawîbûna hemû cureyên tundiyê dibînin û pênase dikin. Aştî tê wateya jiyaneke wiha ku jin lê neyên kuştin û nasnameya wan neyên înkarkirin. Ji ber van sedemên ku me dane diyarkirin, em ê têkoşîna xwe ya ji bo aştî û civaka demokratîk a komunal mezin bikin. Di vê xetê de wek xweparastin jî me komunal destnîşan kir. Her wiha komun xweparastina herî bingehîn e.”

**Pêşengiya aştî û civaka demokratîk**

Xecê Oncu di axaftina xwe de bal kişand ser pêvajoya ”Aştî û Civaka Demokratîk” û ev tiştê anî ziman: “Îro pêvajoya “Aştî û Civaka Demokratîk” dest pê kiriye. Weke TJA dibêjin aştî û civaka demokratîk dê çawa bêtundî were avakirin? Îro pêşengiya wê jin dikin. Di heman demê de mal bi mal, tax bi tax, kolan bi kolan ne tenê jin bi hemû kesan re yanî kesên îro di nav vê civakê de jiyana xwe berdewam dikin bi zarokan re jî bi mêran re jî rûndinên û em ê civakeke bêtundî çawa ava bikin wê biaxivin. Yanî tundiya li ser jinan, li ser zarokan çawa derdikeve holê em ê bi hev re tespît bikin. Em ê atolyeyên xwe li dar bixin. Wexta ku îro civakeke ku lê tundî hebe bandora xwe li hemû kesan dike. Yanî em bêjin encamên wê çi ne. Em ê vana bi hev re nîqaş bikin. Em bi hev re çareser bikin. Ji ber vê yekê weke TJA li her kolan, tax û gundan jinên ku bi tundiyê re rûbirû dimînin em ê li cihê ku li dijîn bi hev re nîqaş bikin. Li aliyê din cihê ku mêr wextê xwe pir lê derbas dikin weke qehwexane, kafeyan hwd. em ê weke TJAyê serdana wan deran bikin û rûnin bi hev re li ser tundiyê biaxivin. Tundiya li ser jinan li ser civakê biaxivin û em dikarin aştî û civakeke demokratîk çawa bi hev re ava bikin nîqaş bikin. Li aliyê din jî em 25ê mijdarê bi hêrsa jinên hatine kuştin pêşwazî dikin. Her wiha dê meşên me çalakiyên me berdewam bikin. Em ê bi jinên ciwan re rûnin, bi jinên ciwan ên zanîngehan dixwînin re atolyeyan li dar bixin. Plansaziyên me saet bi saet roj bi roj hene ku em ê aştî û civakeke demokratîk a ku di hundirê wê de tundî tune be çawa ava bikin.”

**‘Em bang li hemû jinan dikin’**

Xecê Oncu herî dawî bang li hemû jinan kir ku bi hev re ber bi azadiyê ve bimeşin û wiha dawî li axaftina xwe anî: “Banga me ji hemû jinan re ew e ku bila werin heta cîhaneke bêtundî, bêmêtingerî û wekhev em bi hev re ava bikin. Têkoşîna jinan di vê civakê de mezintir bikin. Em bang li hemû jinan dikin ku ber bi azadiyê ve bimeşin û em gotina xwe mezin bikin ronesansa jinan li jiyanê pêk bînin. Ji bo jiyaneke bêtundî divê ji her demê zêdetir li dora nirxên demokratîk ji nû ve bibin yek. Em nirxên komunal ên civakî derxin holê bibin xwedî gotin û îradeya xwe em xwe bi rêxistin bikin, derdora xwe birêxistin bikin, hemû jinan bi rêxistin bikin. Ji ber vê yekê em 25ê mijdarê ji aliyekê ve bi hêrsa jinên ku hatine kuştin ji aliyê din jî bi hêviya avakirina aştiyê ku li erdnîgariya me serwer e em weke jinan vê 25ê mijdarê jî pêşwazî dikin.”

# Divê em di warê fikrî de xwe azad bikin

Bihar Kobanê



Di serdema civaka xwezayî de hişmendiya zayendperest nebû. Jixwe civak ji hêla dayika xwedawend ve dihat birêvebirin û rêbaza dayikê komî, wekhev û bi edalet bû. Heta niha jî ew çand bi dayikê xuya dibe. Piştî mêrê xasûk û komploger dest bi hîleyên xwe kir, pergala dayikê hilweşiya û li şûna wê pergala mêrê serwer hat bicihkirin. Bi vî awayî hemû jiyana jin û civakê serûbinî hev bû. Piştî hilweşîna pergala dayikê mirovahiyê hew xweşî û aramî dît, dinya lê tarî bû. Mirov dikare bibêje ku 30 hezar sal in civak di nav koledariyeke reş de dijî û hew jiyan li wan xweş tê.

Dema mêr dibin desthilatdar hişmendiya zayendperest jî weke tovekî pê re çêdibe û roj bi roj mezin dibe. Ev desthilatdariya li ser jinan desthilatdariya li ser civakê ye û jiyana civakê jî bi xwe re bandor dike. Bi vî awayî civak jî li derûdora jinan dibe kole. Wexta em qala civaka zayendperest dikin hemû zordarî, înkar, tundrewî, şer, talan û destdirêjî tê bîra mirovan. Mijara pergala baviksalar tenê hilweşîna pergala dayikê nîne. Mijar ji wê gelekî mezintir e, lê her em wiha fêr bûne ku mijar koledariya jinan e. Weke ku berteka me jinan li hemberî mêran heye, tê şîrovekirin. Lê teqez wiha nîne.

Tişta heye ew e ku rojane bi hezaran mirov tên kuştin. Mirovahî tev di nav xetereyê de ye û wiha li mirovan hatiye ku di hêla ruhî û fikrî de têne kuştin. Kuştina mirovan di hêla fizîkî de xêra xwedê ye! Ji ber bi komî mirov di warê fikrî û ruhî de tên tunekirin, aramî li wan tune ye. Nexwe divê em pir baş lêkolîn bikin û xwe bînin asta ku em siyaseta kuştina mirovan a fikrî û ruhî bizanibin û bi vî awayî dest bi çalakiyê bikin. Em weke jin pir dilrehm û mihrîban in ku her em bêsînor wefadar û durist in. Lê mixabin em her hatine xapandin û ev jî bûye zemîna ku mêr li ser teserufê bikin.

Niha jin zana ne û haya wan ji siyaseta mêran heye. Gihiştine qinyata ku divê ew xwe bêhtir bi pêş bixin û xwe ji bandora hişmendiya mêr xelas bikin. Eger em xwe ji wê hişmendiyê xelas nekin, em ê bi temamî têk biçin. Heke em têk biçin wê civak jî bi temamî wenda bike. Bi vî awayî, em ê 30 hezar salên din jî kole bimînin û wê mehşer çêbibe. Heke weke jin em vê torê neqetînin û xwe ji xefkê dernexin wê jiyan li me reş bibe.

Ez bixwe weke jinekê wiha dihizirim ku pêwîst e, em jin xwe bikin yek û birêxistin bikin da ku em ji civakê re jî bibin pêşeng û serkêş. Hewce ye ku em li dîrokê bikolin û heqîqeta heyî derxînin ber çavan. Ji bo mêr jî rastiya xwe bibînin û hişê xwe bînin serê xwe ev xisûs pir girîng e. Pêwîst e ku em hemû di warê fikrî de jî xwe azad bikin û bi xwe bawer bin.

Divê em bi nasnameya xwe têbikoşin, mêran jî bînin ser xeta rast û wan zana bikin. Jixwe rêber Apo qala necivakbûna mêr dike û ev jî pir xeter e. Pêwîst e ku zayendperestiya civakê ku jin jî bûne şirîkê mêran, were bidawîkirin. Hewce ye ku em jin û mêran nûjen bikin.

Her wiha ji bo pêvajoya Rêber Apo daye destpêkirin, em xwe amade bikin û ji Rêbertî re jî bibin alîkar. Dem hatiye ku em li hember tevahî kevneşopî û gemara 30 hezar salî dest bi seferberiyekê bikin, pakî û xweşiyê bînin cîhanê û jiyana xwe nûjen bikin.



Mizgîn Ronak

# Nameya Lalik

Mijdar e dîsa. Pelên zer behsa te dikin, darên bi tenê, şaxên ku li tembûra stranek xemgîn dixin. Teyr û tilûrên ku koç dikin, ewrên ku serê xwe derdixin û behsa zivistanê dikin… Tev behsa te dikin. Ez niha çi dikim nizanim, min digot qey ez ê êdî ji te re nenivîsînim û bi gotinên ji rêzê û şermok behsa te nekim. Min digot qey pênûsa min mir, peyvên min şewitîn, hiş û dilê min ji ser hemdê xwe şemitîn.

Loma jî niha nizanim çi dikim, tu jî nizanibe xwişka delal, zaroktiya min a yekane û esîl eşq û evîna min a şoreşger û netebat… Demek e li derve me. Qaşo gihîştim mal û bajar û gundên me herduyan. Qaşo derketim ji zindanê. Lê niha zindan êdî tiştek din e û didome. Nebûniya te û we ye zindan. Valahiya mezin û fezayî ya ku te çêkiriye. Ev zindana bêgardiyan welê zor e ku tu nikarî di ber xwe jî bidî.

**Nebûna te zindan e hewarê!**

Wendabûna te ya ji asîmanê jiyanê zindan e. Cihê te yê vala dojehek welê ye ku kes nabîne. Bêjim jî nayê têgihîştin. Halbûkî ku tu-hûn hebûna dê çi xweş bûya her tişt. Dê gihîştinê porê me bi xewna perperokên azadiyê bihona. Dê bajar paqij bûna bi hatina we pakrewanan. Gur û çeqel newêribûna bikevin cihê şêran. Dê hechecîkan me bi xwe re bibirana zaroktiya me û mezinbûnek dilpak û rûgeş li bejna me bikirana.

Ev ne name ye tu dibînî. Ev ew gotin in ku ez ji bo wan dîn bûme. Ev ne xezelxwîniyek zer a bo payîzê ye. Ev ne gotin in jî. Lê hawar hawara pelên zer ên di cerg û hinavên min de ye. Pelên zer pir zer in niha Nexweş in. Di cerg û hinavê min de dipirpitin, lê nikarin bimrin jî. Nebûna te nahêle ez bimirim jî bi van pelên payîzê re.

Îja dar jî digirîn van rojan. Pelên zer ên li jêr wan weşandî hêsirên wan in jixwe. Çiqas dar ewqas hêsir, çiqas hêsir ewqas payîz. Lê me çi ji bêhna payîzê hez dikir berê. Ji pîvokên payîzê yên ku li nav bênder û zeviyên zer vedibûn, wek kenîna dînan bûn ne? Payîz û kulîlk vekirin? Tew digotin qey bihar e, welê bi kêf û nazik. Ez niha ji pîvokan jî hez nakim û direvim ji wan. Ku min bikaribûya ji payîza li cerg û hinavê xwe jî bireviyama dê çi baş bûbûya. Ku min karibûya xwe ji vê zindana ku ji nebûna te çêbûye rizgar bikira dê çi xweş bûbûya. Hema bila pîvok têra xwe dîn û dîn vebûna û bikeniyana. Em jî li pey wan bûbûna hîrehîra ewrên sermestiya payîzê.

Ev ne name ye ha! Ne gazin û lome jî. Di xewnereşkekê de me niha û bi tiliyên hesretê xêzik mêzikan çêdikim. Belkî gur bibînin û bitirsin û çeqel bixwînin û ji kerban bimirin. Vî welatê kambax ne zaroktî hişt ne mezintî, ne bihar hişt ne payîz. Vî welatê dîlî û belengaziyê ne veger hişt ne gihîştin. Tenê şanoyek peritî ma ji me re. Herkes dizane ku herkes kî ye û her tişt çi ye, lê xwe li nezanînê datîne.

Îja vê bêdengiya te-we dil û hiş diperitîne. Xwezî tu biqîriyayî mesela ji wê nebûna dûr. Te baranek kevir bibaranda. Tevî bafirokên vê şanoya ne şano li bin guhê erdê bixista. Xwezî tu li bahozek siwar bûbûyayî û bihatayî. Xwezî te keziyên me yên zarokê li çîrokek dînewer bikişanda û tu bihatayî. Hema bila tu bihatayî… çi, çawa dibû bila bibûya.

Mijdar e. Hêsirên daran zer û kom bûne li binê wan; payîz e, hêsir li her derê bûne golên zer.

**Ax golên zer…**

Ax hêsirên payîzê, xwezî we ez bifetisandama. Ax refên teyran, xwezî we xwişk û birayên me bihara… qet nebe biharê bi xwe re bianiya.

# Kî zeytûnan didize?

Komên paramîlîter ên girêdayî Tirkiyeyê ku axa Efrînê dagir kiriye, darên zeytûnan ên welatiyan talan dikin. Komên paramîlîter di meheke dawî de, li Efrînê zêdetirî hezar darên zeytûnan birîn û bi sedan çewal zeytûn dizîn

Sosin Gulo



Ev komên paralîmîter ên girêdayî Tirkiyeyê her tim bi talankirin, wêrankirin, revandin, kuştin û diziyê dikevin rojevê. Bi taybetî li Efrînê hem welatiyan direvînin û hem jî mal û milkên welatiyên Efrînê talan û wêran dikin.

Rêxistina Mafên Mirovan a Efrîn-Sûriyeyê ragihand ku 4 mijdarê zeytûnên gundê Kotana yê bajarokê Bilbilê yê Efrînê hatin dizîn û çiqilên daran hatin şikandin. Rêxistinê diyar kir ku komên çete li baxçeyên welatiyên Efrînê Mistefa Ehmed Çolaq, Yehya Seydo Horo, Mistefa Ehmed Meimiş, Mihemed Îsa Meimiş, Behrî Xelîl, Menan Qadir Seydo, Xelîl Nûrî Horo zeytûn dizîne.

Girêdayî heman mijarê, serçeteyê çeteyên dewleta tirk a dagirker ê bi navê Ebû Cuma tevî Ebdulhefîz Berekat destê xwe danîn ser berhemên gelek welatiyên gundê Hesendêra yê girêdayî bajarokê Bilbilê. Nûnerên rêxistinê diyar kir ku çeteyan nehişt şênî Ebdulcelîl Îdan baxçeyê xwe ya ji 200 daran pêk tê, cot û kesaxe bike. Nûneran di raporê de dan zanîn ku baxçeyê welatî li kêleka gundê Şealê ye. Çeteyan ew bi zorê ji nav baxçe derxist.

**150 dar talan kirin**

Rexistinê da zanîn ku 31ê cotmehê, komeke girêdayî Tirkiyeyê di 2 rojan borî de bi kêmanî 150 darên zeytûnan talan kirin û şikandin. Rêxistinê da zanîn ku li ser rêya gundê Heyat-Deşta Ketixê yên gundewarên Efrînê derdora 150 darên zeytûnan ên şêniyê bi navê Şukrî Dimilî talan kirin û şaxên wan şikandin.

**50 dar dizîn**

Rêxistina Mafên Mirovan a Efrînê-Sûriyeyê ragihand ku 27 cotmehê komeke niştecihan berhema zêdetirî 50 darên zeytûnê dizî. Darên zeytûnê yên kesên bi navê Şukrî Elî Murad, Mihemed Elî Murad û Îbrahîm Elî Murad in ku ew şêniyên gundê Bîkê yên Efrînê ne.

Nûnerên rêxistinê destnîşan kir ku di çend rojên borî de (beriya 27ê cotmehê) wan dizîna zêdetirî 900 darên zeytûnê yên gund û bajarên Efrînê belge kiriye. Ev yek bi destê serçeteyên komên çete yên girêdayî dewleta tirk a dagirker ku bi navê berpirsên "aboriyê" tê nasîn pêk tê. Wan serçeteyan ji 100 heta 300 kes anîne herêmê û weke kom bi çeteyan re zeytûnan didizin.

Rêxistinê diyar kir ku hin berhemên hatine dizîn, li gundê Kurdo yê bajarokê Bilbilê ye. Çeteyê bi navê Ebû El Iz ku serçeteyê Ceyş El Nuxbê ye, beriya 2 rojan berhemên zêdetirî 200 daran dizîn ku xwediyê wan Cemal Reşîd Reşkêlo ye.

**500 ciwanan zeytûn dizîn**

Nûnerên rêxistina mafên mirovan ragihand ku çeteyan, 21ê cotmehê, li gundewarê Efrînê derdora 150 kîsên zeytûnan ên Hisên Mihemed Hemo û Îbrahîm Mihemed Hemo û derdora 500 çewalên din ên şêniyê bi navê Ebdurehman Kolîn Hemo dizîne.

Nûnerê Mafên Mirovan Îbrahîm Şêxo têkildarî dizî û talankirinê anîbû ziman ku buroya aborî ya girêdayî rêveberiya Efrînê ya girêdayî dewleta tirk hîn jî tiştên zehmet li welatiyên vedigerin gundên xwe ferz dike û wiha gotibû: "Wekî belgeyên erdan, heke xwediyên erd miribin, mîrasê dixwazin. Rê nadin welatî beriya 15ê cotmehê zeytûnan berhev bikin. Li aliyê din, komên çete yên girêdayî dewleta tirk û malbatên wan li ber çavê dewleta tirk zeviyên welatiyan talan dikin."

**Dest danîn ser darên zeytûnan**

Komên paramîlîter ên Hemzat û Emşat ên girêdayî dewleta tirk, 5ê îlonê, hezar darên zeytûnan ên malbata Bîlal Oso ya ji gundê Elî Jaro yê bajarokê Bilbilê yê Efrînê desteser kirin. Çavkaniyên xwecihî daxuyand ku çeteyan kokên darên zeytûnan bi rengê sor boyax kirin. Ev yek îşaretê pê dike ku demsala îsal ji bo wan e û desteser kirine. Hevjîna Bîlal Oso ya bi temen, da ku xweyîtiyê li darên xwe yên zeytûnan û mala xwe bike demek berê vegeriyaye gundê xwe.

# 80 hezar zarok li kolanan dijîn

Yilmaz Yilmaz

Peymana Mafên Zarokan ji aliyê Neteweyên Yekgirtî ve, 20ê mijdara 1989an hat qebûlkirin. Her sal 20ê mijdarê wek Roja Mafên Zarokan a Cîhanî tê pîrozkirin. Peymana derbarê mafên zarokan de, ji bo ku şert û mercên jiyanî yên zarokan baş bike, hin berpirsyariyan li dewletan ferz dike. Lê li Tirkiyeyê bi deh hezaran zarok, ji mafên xwe yên bingehîn hatine mehrûmkirin û bi gelek arîşeyên ji xwe mezintir re rû bi rû hatine hiştin. Tirkiye sala 1994an Peymana Mafê Zarokan îmze kir.

Ev peyman bi 54 xalan mafên zarokan diparêze. Her dewleta ku ev peyman îmze kiriye, divê 54 xalên peymanê pêk bîne. Lê Tirkiyeyê sê şerh danîne ser xalên 17, 29 û 30emîn ên peymanê. Ev şerh, hem serboriya zarokan hem jî siberoja zarokan înkar dike û wan ji bikaranîna mafên wan ên bingehîn dûr dixe.

Li gorî Konvansiyona Neteweyên Yekbûyî ya li ser mafên zarokan, her zarok xwedî mafê gerdûnî yê jiyanê ye. Mafê hemû zarokan wekhev in. Girîng nîne ku ew li ku dijîn, ji ku hatine, rengê çermê wan çi ye, dayîk û bavên wan çi karekî dikin, bi çi zimanî diaxivin, mezheba wan çi ye, keçik in yan kur, bi kîjan çandê dijîn, astengdar û kêm endam in yan na û zengîn in yan hejar!

Dewlet bêyî ku cudahiyê bike nav nasname, reng, bawerî, ziman, war û rengê zarokan, divê mafê hemû zarokan wekî hev biparêze û ji bo pêşketina wan xizmeta wan bike.

Zarok divê bikaribin bi dayik û bavên xwe re bijîn. Dikaribin bi zimanê dayikê perwerde bibin û ji hemû mafên tenduristiyê sûdê werbigirin. Her zarok xwedî maf e ku di şertên herî baş de bijî.

Li gorî lêkolînên ILO û UNICEFê yên sala 2024an, li cîhanê nêzî 138 milyon zarokên karker hene. Ji van zarokan 54 milyon zarok karên tehlûke û giran dikin.

**42 hezar zarok li kolanan dijîn**

Li gorî daneyên dawî yên fermî, li Tirkiyeyê herî kêm 42 hezar zarok li kolanan kar dikin. Lê li gorî daneyên nefermî nêzî 80 hezar zarok li kolanan kar dikin.

**1.3 milyon zarok karker in**

Li gorî daneyên ku parlamenterê CHPê Velî Agbaba têkildarî 12ê hezîranê roja têkoşîna bi karkeriya zarokan re, bi raya giştî re parve kirin, li Tirkiyeyê hejmara zarokên karker di 2023an de gihişt 759 hezar zarokî. Sala 2024an, hejmara zarokên karker gihîşt milyon û 312 hezar 344 zarokî.

**Zarok dibin qurbanî**

Ji îlona 2024an heta dawiya îlona 2025an, 81 zarokên karker, di karên cuda de jiyana xwe ji dest dan. Ji îlona 2024an heta texaba 2025an, herî kêm 72 zarok bûn qurbana qezayên kar. Di îlona 2025an de jî 9 zarok bûn qurbana kar. Di 13 mehên dawî de 81 zarok bûn qurbana kar. Di navbera salên 2013 û 4 mehên ewil ên 2025an de herî kêm 261 zarokên di navbera 5 û 14 salî de, bûn qurbana qezayên kar. Di heman salan de, 509 zarokên ku temenên wan 15-17 salî bûn qurbana kar.

**4 hezar zarok girtî ne**

Li gorî daneyên dawî li Tirkiyeyê 402 girtîgeh hene, li tevahiya Tirkiyeyê 420 hezar û 904 mirov girtî ne. Ji van girtiyan 357 hezar û 646 kes hatine cezakirin û 63 hezar 258 kes jî girtî têne darizandin. 6 hezar û 543 girtî temenê wan di ser 65 salî re ye. Li tevahiya girtîgehan 4 hezar û 561 zarok girtî ne ku temenê wan di navbera 12-18 salî re ye.

**Polîs û leşkeran 73 zarok kuştin**

Li Tirkiyeyê hin daneyên derbarê encama şerê salên 2011 û 2021ê de wiha ne: 73 zarok bi guleyên polîs û leşkeran jiyana xwe ji dest daye, 62 zarok bi teqînên bombeyî jiyana xwe ji dest daye, 39 zarok bi teqînên kemînan jiyana xwe ji dest daye, 33 zarok di nav şer de jiyana xwe ji dest daye, 18 zarok bi maşîneyên zirxî yên polîs û leşkeran jiyana xwe ji dest daye û 9 zarok jî di çalakiyan de bi guleyên polîsan jiyana xwe ji dest daye.

UNICEFê di rapora xwe ya 2023yan de aşkere kir ku zêdetirî 100 milyon zarok ji ber pevçûn, tundî û koçberiyê neçar mane ku malên xwe biterikînin. Li gorî lêkolînan, ji Şerê Cîhanî yê Duyemîn vir ve, ev hejmara herî zêde ye.

# Gel ji hilbijartinên Iraqê bêhêvî ye

Gabriel Başo

Komîsyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinên Iraqê ragihand ku roja 8ê mijdarê propagandaya ji bo hilbijartinê bi dawî dibe. 9ê mijdarê jî pêvajoya dengdanê ya taybet wê dest pê bike.

Amadekariyên ji bo hilbijartina dema şeşemîn a parlamentoya Iraqê bi pêşengiya Komîsyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinên Iraqê berdewam dike. Komîsyonê diyar kir ku roja 9ê mijdarê pêvajoya dengdana taybet ya ji bo hilbijartina parlementoyê dest pê dike û 11ê mijdarê jî dengdana giştî dest pê dike.

Şîrovekarên siyasî yên li Iraqê diyar dikin ku hilbijartin dê di jêrbandora nakokiyên siyasî yên Amerîka û Îranê de pêk bên. Siyasetmedar tînin ziman ku ji bilî Amerîka û Îranê, Tirkiye û welatên din jî hewl didin bandora xwe li hilbijartinê bikin.

Li gorî agahiyên komîsyonê, dê 304 çavdêrên navdewletî çavdêriyê di hilbijartina parlementoya Iraqê de bikin. Dê zêdetirî hezar û 500 rojnamevanên navxwe û navdewletî jî pêvajoya hilbijartinê bişopînin.

**Hezar û 110 maf binpê kirin**

Berpirsê Navenda Metro ya Parastina Mafê Rojnamevanan Rehmen Xerîb bal kişand ser binpêkirinên di dema propagandaya dema şeşemîn a hilbijartina parlementoya Iraqê de hezar û 110 binpêkirin hatine tomarkirin. Rehmen Xerîb, da zanîn ku herî zêde binpêkirin li parêzgehên weke Bexda, Mûsil, Hewlêr û Silêmaniyê hatine tomarkirin.

**Iraq di rewşeke aloz de ye**

Rojnameger û çalakvanê siyasî yê başûrê Kurdistanê Hawkar Ezeb Mîke derbarê hewaya hilbijartina ku wê 11ê mijdarê li Iraqê pêk bê, axivî.

Havkar Ezeb Mîke anî ziman ku ji hilbijartina parlementoya Iraqê re çend roj mane û got: "Çavê me tevan li wê rojê ye ku hilbijartin bê pirsgirêk pêk were û bi dawî bibe. Ji ber ku çavê me tevan li wê yekê ye ku piştî hilbijartinê pêk bê, guherînên giştî li herêmê û bi



taybet li Iraqê pêk bên. Iraq di rewşeke nediyar de ye. Dibe ku hilbijartin bibe deriyeke guherînên mezin li welêt. Di warê praktîzekirina demokrasiyê de, Iraq di asteke xirab de ye. Ya ku niha bi navê hilbijartinê pêk bê zêdetirî xwe dişibe seneryoyeke ji bo kişandina wêneyê siberoja welêt, ne ku proseyeke demokrasiyê ye. Têkildarî herêma Kurdistanê, partî û aliyên tevlî hilbijartinê jî bibin; weke du aliyên hêzên desthilat Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) û Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê (YNK) wê li pêşiya dengan bin, her gav yek bibe yekemîn û yê din jî duyemîn be. Ji ber ku ew xwedî hêz, pere û desthilat in, ji bo berjewendiyên partiya xwe ne dudil in."

Hawkar Ezeb Mîke, da zanîn ku propaganda û pêşbirkeke xurt heye di navbera aliyan de û got: "Ji bo her yek herî zêde deng û kûrsî li parlementoyê bi dest bixe dibeze. Li gorî berê propagandayên niha hinek din nermtir in."

**Gel bêhêvî ye**

Mîke anî ziman ku bi şêwazeke giştî civak û gel ji guherîn û veguherînên bi hilbijartinê bên kirin bê hêvî ne û wiha lê zêde kir: "Çav li rê ne ku baykot û neçûna ser sindoqan pir zêde be. Ev yek jî çavkaniya xwe ji rewşa neasayî, krîzên aborî, nebûna mûçe ya çend salên borî ya li başûrê Kurdistanê digire. Piranî aliyên biçin ser sindoqan jî alîgir û kadro ne ku ji partiyan sûdê werdigirin. Nexwe weke civak û kesên asayî ti baweriya wan bi hilbijartinê nîne. Ji ber ku baş dizanin ku pêngavên guherîn û veguherînê bi rêya hilbijartinê pêk nayên."

**Bandora çavdêrên li ser hilbijartinê**

Hawkar Ezeb Mîke herî dawî destnîşan kir ku ji 30 salên borî mirov dikare derbixe ku hebûna çavêdêriyê ya li hilbijartinê ti bandoreke xwe nîne û wiha bi dawî kir: "Nafikirim ku niha jî hebûna çavdêran bandorê li encamê bike. Ji ber ku sîstema hilbijartinê û yasaya komîsyonê, bîr û ramanên aliyên siyasî ti rol û misyon ji bo gotinên çavdêrên hilbijartinê nehiştiye. Bi dîtina min eger hemû çavdêrên navxwe û navneteweyî jî diyar bikin ku di pêvajoya hilbijartinê de sextekarî û dizî pêk hatiye, ji ber giliyê wan bandorê li yek dengî nake, ne dengek zêde ne jî kêm dike. Di hilbijartinên başûrê Kurdistanê û Iraqê de mafê dengdar, namzet û partiyan hatine binpêkirin, li aliyê din partî û namzetên xwedî hêz û desthilat karîne mafên yên din binpê bikin. Ev hilbijartin jî bê sextekarî nabe, her kes vê dizane û heta astekê jî asayî bûye."

## LI DIJÎ BAJARÊN KU ÇANDA MÊRPERST AVA DIKIN

# Bajar ji nû ve tên sazkirin

■ Medya Bal

*Hişmendiya mêrperest a ku li ser berjewendiyên mêran hatiye avakirin, ji destpêka avabûna xwe heta niha bandora xwe li ser hemû jiyana civakê dike. Di nav bajarên ku hatine avakirin de, ji plansaziya bajêr heta îmar û avahiyan li gor hişmendiya mêrperest hatine avakirin. Xweza di nav van bajaran de hatiye qirkirin. Çanda jinan ku bûye malê civakê, tune hatiye hesibandin.*

*Partiyên kurd ên ku li ser perspektîfa azadiyê hatine avakirin di hemû xebatên xwe de hewl dane ku di rêvebirinê de wekheviyekê ava bikin. Kotaya jinan a ku di destpêka xebatan de esas hat girtin û hevserokatiya ku li hemû saziyan tê pêkanîn ew hişmendiya mêrperest a di nav siyaset û rêvebirinê de heta astekê kêm kiriye.*

*Lijneya Rêveberiya Xwecihî ya DEM Partiyê wek berdewamiya van xebatan, li dijî bajarên ku bi hişmendiya mêrperest tên birêvebirin xebata avakirina bajarên jinan da destpêkirin. Destpêkê wek cihê pîlot dê li Amed, Nisebîn, Cizîr, Artemêt û Geverê xebat bên meşandin. Bi îlankirina bajarên jinan hewl tê dayîn ku texrîbata hişmendiya mêrperest ava kiriye ji holê bê rakirin.*

*Em der barê îlankirina bajarên jinan û armanca avakirina van bajaran de bi hevşaredara Bajarê Mezin a Wanê û hevseroka GABBê Neslîhan Şedalê re axivîn.*



Hevseroka GABBê Neslîhan Şedal der barê bajarên jinan ên ku hatine îlankirin de got: “Di bajarên heyî de li her qadê çanda zilamtiyê tê afirandin. Di nav wan bajaran de ji bo jinan û ji bo kesên ku hez bikin li gor pîvanên exlaqî û polîtîk bijîn, cih tune ye. Li hemberî vê jiyana bêwate divê ku bajar dîsa bi aqil û ruhê jinan bên avakirin.”

***Lijneya Rêveberiya Xwecihê ya DEM Partiyê bi daxuyaniyekê bajarên jinan îlan kir. Bajarên jinan tê çi wateyê û we çima pêdivî bi îlankirina van bajaran dît?***

Dema ku mirov behsa bajarên jinan dike û behsa wateya wan dike, divê ku pêşî em li ser bingeha dîroka bajarên jinan jî bisekinin. Ji ber ku di nav vê dirokê de rasteqîniya bi kîjan hişmendiyê hatiye avakirin û bi kîjan rebazê hatiye birevêbirin heye. Em jî wê rasteqîniyê ji hezaran salan beriya niha de di civakên exlaqî û politîk de dibînin. Bi taybetî jî wateya bajarên jinan; ew bîr û şûnwara bi hişmendiya jinan hatiye avakirin, pîvanên civaka exlaqî û polîtîk di nav xwe de dihewîne. Ew civak bi pêşengiya jinan hatine avakirin û birêvebirin. Watedayîna jiyanê di şexsê jinan de çêbûye. Têkiliya jinan a bi civakê re, ya bi xwezayê re, ya bi kesan re têkiliyek demokratîk e. Piştgiriya civakî jî bi vê felsefeyê re hatiye avakirin. Serdestî, bindestî û hiyerarşî di nav civaka exlaqî û polîtîk de tune ye. Jin û zilam di nav vê civakê de wateyê didin hevdu û hevdu temam dikin. Bi vê nêzîkbûnê jiyan watedartir dibe. Bi taybetî jî hişmendiya zayendperest di nav vê civakê de tune ye. Bi xwezaya xwe jin pêşeng e. Ji ber ku afirandina her pêdiviya civakî bi pêşengiya jinan hatiye afirandin. Hilberîn ji her wiha… Lê ya herî girîng ew e ku her kesê vê civakê xwedî vîn e. Di rêveberiyê de her kesek xwedî gotin e.

Lê mixabin piştî hişmendiya zayendperet hatiye avakirin, li gor xwe û hişmendiya xwe bajar ava kirine. Ev bajar jî çanda zilamtiyê diafirînin. Bajar bi hişmendiya zilamtiyê ve tên birêvebirin. Di nav wan bajaran de ji bo jinan û ji bo kesên ku hez bikin li gorî pîvanên exlaqî û polîtîk bijîn, cih tune ye. Tekiliya jinan a bi civakê re, ya bi jiyanê re û bi taybetî ya bi zilaman re hatiye qutkirin. Bi avakirina van bajaran ve qirkirina jinan, ya xwezayê, ya civakê û di heman demê de ya jiyanê dest pê kiriye. Li hemberî vê jiyana bêwate divê ku bajar dîsa bi aqil, ruh û nêrîna jinan bên avakirin.

***We Amed, Nisebîn, Cizîr, Artemêt û Geverê wek bajarên jinan îlan kirin. Gelo çima we destpêkê ev bajar hilbijartin?***

Li nav rêveberiyên xwecihî keda hevalên me yên jin pir zêde ye. Îlankirina bajarên jinan jî ji aliyekê ve xwedîderketina li mîrateya van hevalên me yên jin e. Ev rojeveke nû jî nîn e. Demeke dirêj e ku di rojeva tevgera jinên kurd de ye. Em jî îro hem li wê kedê xwedî derdikevin hem jî wê têkoşînê mezin dikin. Ji ber vê yekê di vê pevajoyê de me bajarê Amed navçeyên Nisebîn, Cizîr, Artemêt û Gever wek cihên pîlot diyar kirin. Taybetiya wan bajaran jî dîrokî ye. Li van bajaran çanda jinan a qedîm heye. Potansiyela rexistinbûna jinan jî bi pêş dikeve. Xwedîderketina li ziman, çand û nirxên civakî jî bi peşengiya jinan çedibe. Lê aliyekî din jî, pergal polîtîkayên şerê taybet jî bi awayekî berfireh dimeşîne. Her wiha polîtîkayên qirkirina jinan dîsa tên meşandin û xizantiya jinan roj bi roj mezin dibe. Sedema hilbijartina van bajaran, li hemberî van politikayên qirêj, diyarkirina vîn û rengê jinan û birêxistinkirina potansiyela wan a li nav bazarê e.

***Heta niha ne wek bajarên jinan bin jî li Viyana, Barcelona û Kerela bi pêşengiya jinan pêdiviyên bajêr tên plansazkirin. Lê wek fikir ya herî nêzî bajarên jinan gundê Jinwarê ye. Lê li vir jî tenê jin dijîn. Hûn ê bi van bajarên ku te navê wan li jor rêz kirin, dê rêveberî û guherîn çawa bin?***

Bi taybetî li Viyana, Barcelona û Kerelayê sazkirina bajêr di qada rêveberiyên xwecihî de bi hişmendiyeke wekheviya zayendiya civakî ve tê birêvebirin. Plansaziya bajêr (îmar û mîmarî), neqilkirin, çand, perwerde, tenduristî, polîtîkayên civakî û bi taybetî sazî-qadên jinan bi heman hişmendiyê tên sazkirin. Ji bo jin zêdetir tev li qadên jiyanê bibin, li qadan zêdetir bibin xwedî vîn û tev li siyasetê bibin, modelên baş in. Taybetiya Jinwarê jî em dibînin ku di nav şer de jiyaneke azad hatiye avakirin. Her qad bi destê jinan hat avakirin. Di Şoreşa Rojava de dîroka avakirina bajaran ango şerê bajar-gundan xwe nû kir. DAIŞê êrişî jiyana heyî dikir û herî zêde jî çav berdabû bajarên jinan ê Palmîrayê. Wek tê zanîn ji hezaran salan beriya niha Palmîra bi pêşangiya Keybanû Zenûbyayê hatibû birêvebirin û rêngê jinan, çanda jinan li bajêr bi pêş ketibû. Li rojavayê Sûriyeyê jî çanda jinan qedîm e. Têkoşîna jinan xwedî bingeheke xurt e. Ji ber ku li ser vê axê çanda jinan xwedî bingeheke xurt e lewma li ser vê axê şoreşa jinan pêk hat. Jinên ku ji tundiya hişmendiya mêrperest reviyan li ser vê bingehê gundê Jinwarê ava kirin. Niha li vî gundî her qada jiyanê bi destê jinan tê avakirin. Jin hildiberînin û xweparastina xwe pêk tînin.

Bajarên ku demek e dirêj e em li ser difikirin jî li hemberî modela rêveberiyên xwecihî yên netewe-dewletê, avakirina modela demokratîk, ekolojîk û azadiya jinan e. Em dixwazin vê pergala ku bingeha xwe ji civakê digire dîsa civakî bikin. Di modela netewe-dewletê de cihê jinan tune ye. Jin xwedî vîn nîn e. Plansaziya bajêr bi hişmendiya zayendperest tên avakirin. Li hemberî vê di serî de ji bo birêvebirina civakê û avakirina politîkayan pêwistî bi nêrîn û aqilê jinan heye. Armanc ev e ku hem li ser jiyana xwe hem li ser jiyana civakê bibe xwedî gotin. Dîsa piştgiriya civakî bi pêşengiya jinan divê were avakirin. Dîsa armanc ew e ku di rêveberiyan de temsîliyeteke wekhev, bi modela hevserekotiyê re rêveberiyeke demokratîk ava bikin. Rêveberiya xwe û civakê bikin. Her kesek bi rengê xwe, bi nasnameye xwe, bi baweriya xwe û nirxên xwe yên civakî ve tev li rêveberiyê bibe. Em dixwazin û hewl didin ku rêveberiyeke pirçandî, pirzimanî, pirbawerî, pirnasnameyî ava bikin.

***Dê di nav van rêveberiyên bajarên jinan de bi taybet ji bo jinan dê hejmara saziyan bê zêdekirin ango kîjan sazî dê bên avakirin?***

Jixwe dê plansaziya bajaran bi nêrîn û perspektîfa jinan were amadekirin. Di encama plansazkirina van bajaran de dê saziyên jinan ên wek; navendên jiyanê, navendên jinan ên piştgiriyê, navendên jinan ên çandê, navendên jinan ên werzîşê, qadên jiyana azad ji bo jinan bên vekirin.

Her wiha dê îmareke ekolojîk, mîmariyeke bêhiyerarşî, kuçe û kolanên ewle werin esasgirtin. Di nav van bajaran de dê civakek bêhiyerarşî û bêçîn a ku bi aqilekî kolektîf were birêvebirin tên hedefkirin.

***Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî di nirxandinên xwe de behsa bajarên jinan û rola jinan a di vê pêvajoyê de dike. Li gorî nêrînên te avakirina van bajaran dê bandoreke çawa li ser pêvajoyê bike?***

Rêberê gelan, azadiya civakê bi azadiya jinan ve girê dide. Di heman demê de, dibêje aştî jî civaka demokratîk jî dê bi pêşengiya jinan ava bibe. Li civakên ku rengê jinan lê tune ye, jin ne xwedî gotin an jî em bibêjin li nav rêveberiyan jin tune bin, em nikarin behsa demokrasiyê bikin. Demokrasiyeke bê jin ne pêkan e. Hem xurtkirina rêveberiyan hem avakirana polîtîkayan û sazkirina bajaran dê demokrasiyê jî xurttir bike. Li aliyekî jî ev sazkirin ne tenê bi awayekî fizîkî ye. Her wiha ev înşakirina civakê ye jî. Înşakirina hişmendiyê ye jî. Ji ber vê yekê hişmendiya civaka exlaqî û polîtîk jî wê bê ava kirin. Ev jî bi rêya komunên jinan dê pêkan bibe. Komunên akademiyê, çandê, tenduristiyê û aboriyê (em dikarin li li gorî taybetmendiyên bajaran bifikirin), dê civakê birêxistin bikin. Piştgiriya jinan di nav van komunan de wê xurttir bibe. Her jin wê xwe tê de bibîne û bibe xwedî vîn. Ji bo ku civak azad û demokratîk bibe, li nav wan komunan dê birdoziya rizgariya jinan û pivanên etîk-estetîkî bibin civakî. Bi vî awayî reng, giyan, aqil û nêrîna jinan çiqas li ser bajaran tesîr bike, civak jî ewqas dê bibe civakeke demokratîk.



## Neslîhan Şedal Kî Ye?

Sala 1988an, li Geverê ji dayik bûye. Civaknas e. 25 sal in li Wanê dijî. Dibistana navîn û lîseyê li Wanê xwendiye. Beşa Civaknasiyê ya Zanîngeha Karatekîn a Çankiriyê xelas kiriye. Gelek proje amade kirine li ser perwerdehî û aboriya jinan. Sala 2016an piştî ku qeyûm tayînî ser şaredariyê hat kirin, ji peywira xwe ya şaredariyê îstîfa kir. 31ê adara 2024an wek hevşaredara Bajarê Mezin a Wanê hat hilbijartin lê qeyûm li cihê wê hat tayînkirin. Niha hevserokatiya GABBê dike.

# ‘Zimanê dayikê wek şîrê wê helal e’

Perwerdehiya bi zimanê dayikê mafekî herî rewa ye. Zarokên ku nikarin bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde bibin, ew bi her peyveke ku jê fêm nakin ji xwe dûr dikevin û hêza wan kêm dibe



Arslan Ozdemir




*“Ji bo kurdan, perwerdehiya bi zimanê dayikê ne îmtiyaz û ne jî daxwazek e; ew tenê mafek e ku di dema jidayikbûnê de tê dayîn.”*

Dengê yekemîn ku mirov dibihîze dengê dayikê ye. Ew deng vediguhere lorîk, dia û evînê; zarok bi wî dengî dikene, bi wî dengî digirî û bi wî dengî ji jiyanê fêm dike. Ji ber vê yekê, zimanê dayikê ne tenê amûrekî axaftinê, lê koka herî kûr a nasname, bîr û xwebûna mirov e. Gotina “Perwerdehiya bi zimanê dayikê bi qasî şîrê dayikê helal e” ev yek bixwe ye. Ew mafê hebûna gelekî diyar dike. Ji ber ku hem şîrê dayikê û hem jî zimanê dayikê mafên jidayikbûnê yên mirovan in; ew ne dikarin werin qedexekirin û ne jî niqaşkirin.

Her wekî ku şîrê dayikê çavkaniya herî xwezayî ji saxlem e ji bo pêşveçûna laşî ya zarokekî/ê, perwerdehiya bi zimanê dayikê bingeha pêşveçûna wan a derûnî, hestyarî û çandî ye. Zarok fêr dibin ku bi zimanê xwe yê dayikê bifikirin, bipirsin, xewnan bibînin, hez bikin û bitirsin. Dema ku zarok bi zimanê xwe yê dayikê neyên perwerdekirin, ew bi her peyveka ku jê fêm nakin ji xwe dûr dikevin û hêza wan kêm dibe.

Zarokê ku nikare bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde bibe, ji pêvajoya fêrbûnê dûr dikeve. Ev dûrketin ne tenê pirsgirêkek zimanî, trawmayek nasnameyê ye jî. Ji ber ku ramanên mirovan bi ziman gur û geş dibin, mirovê ku ji zimanê xwe bêpar be, ji mafê fikirînê jî bêpar e.

Ziman bîra civatekê ye. Zimanê gel vedibêje bê ka ew cîhanê çawa dibîne, çawa hez dike û çawa êş dikişîne. Dema ku zimanê zikmakî tê qedexekirin, ne tenê peyv, lê hest jî kêm dibin. Her ziman rêyek hebûnê ye; ji ber vê yekê, paşguhkirina zimanek tê wateya paşguhkirina gel bixwe.

Ji ber vê yekê perwerdehiya bi zimanê zikmakî ne hilbijartinek e, rêyek hebûnê ye. Zarokek ku bi zimanê xwe perwerde dibe, ne tenê zanînê bi dest dixe; ew xwe nas dike û fêm dike ka ew kî ye. Ev girêdana bi zimanê wî re baweriya bi xwe çêdike.

Mafê perwerdehiyê bi zimanê dayikê ne tenê pirsgirêkek pedagojîk, her wiha pirsegirêkeke exlaqî ye jî. Wijdanê civakekê bi wê yekê tê pîvandin ku ew çiqas bi zarokên xwe re dadperwer e. Astengkirina zarokekî ji perwerdehiya bi zimanê dayikê, wekî rawestandina şîrê dayika wî ye. Her du jî binpêkirina mafê jiyanê ne.

Gotina, “Perwerdehiya bi zimanê dayikê wekî şîrê dayikê helal e”, bi vê wateyê, bangek e ji bo wijdanan. Ji ber ku tiştê helal ew e ku ji hêla xweza, edalet û mirovahiyê ve hatiye pejirandin. Zimanê zikmakî helal e ji ber ku zirarê nade kesî û kesî ji civakê dûr naxe. Berovajî vê, ew mirovan bi xwe û bi civakê ve girêdide.

Pêşeroja civatê wê demê misoger dibe ku zarokên wê bikaribin bi zimanê xwe bifikirin. Mafê perwerdehiyê bi zimanê dayikê ne nîmetek e, lê encama herî xwezayî ya mirovbûnê ye. Zarokek ku bi zimanê dayikê fêr dibe ne tenê xwendekar e, ew hilgirê çand û dengê gelê xwe ye jî.

Ji bo kurdên ku li Bakur û Tirkiyeyê dijîn, daxwaza perwerdehiya bi zimanê dayikê ji bo kesî ne dijwar e; berovajî vê, ew îradeya gelekî ye ku bi sedsalan li ser van axan kok berdaye, bi êş û kêfxweşiya xwe beşek ji vî welatî ye, ku bi nasnameya xwe û bi dengê xwe hebe. Ev daxwaz xwestekek e ku bingeha jiyana hevbeş a birûmet xurt bike, ne veqetînê. Ji bo gelekî ku dixwaze zimanê xwe zindî bihêle, di rastiyê de, ji welatê xwe hez dike; lê ew dixwazin vê evînê bi rengên xwe û bi gotinên xwe vebêjin.

Daxwaza kurdan a ji bo perwerdehiya bi zimanê xwe yê dayikê ne îdîayek e ku di nav siyasetê de hatiye pêçandin û ne jî dengvedana dabeşbûnê ye. Ev daxwaz îfadeya hemwelatîbûna wekhev, rûmeta mirovan û xwestekek hevpar a ji bo aştiyê ye. Ji ber ku naskirina zimanê gelekî ne ji bo dabeşkirina wan e; ew ji bo têgihîştin û baweriya bi wan e. Yekîtiya dewletê ne bi rêya tepeserkirina cudahiyan, lê bi rêya atmosferek edaletê mimkun e ku her nasname dikare bi azadî nefes bigire.


Her zarokekî kurd bi lorika diya xwe mezin dibe. Berî ku ew bikaribin biaxivin jî, ew bîranînên hezar salî yên gelê xwe hildigirin. Ger ew bi zimanekî ku ew fêm nakin perwerde dibin, ew ne tenê ji peyvan bixwe, ji cîhanê jî dûr dikevin. Lê belê, zarokekî ku bi zimanê dayika xwe fêr dibe, hem xwe û hem jî yên din çêtir fam dike; ew di dilê xwe de aştiyê û di zimanê xwe de evînê diçîne.

Û ji wê peyva yekem a ku bi dengê diya xwe gotî, ew zarok ji cîhanê re dibêje:

“Ez heme; ez bi zimanê xwe, bi nasnameya xwe, wekî welatiyekî wekhev ê vî welatî heme.”

Ev deng ne dijwarî ye; ew bangek ji bo aştiyê ye. Ji ber ku kes ji ber axaftina bi zimanê xwe yê dayikê sûcdar nîne, divê kes ji ber ku dixwaze zimanê xwe yê delal zindî bihêle neyê paşguhkirin. Ji bo kurdan, perwerdehiya bi zimanê dayikê garantiya jiyaneke birûmet, pêşerojeke aştiyane û wekheviya mirovan e.

***Û tam ji ber vê sedemê, perwerdehiya bi zimanê dayikê ji bo kurdan wekî şîrê dayikê helal e ji ber ku ew hem xwezayî, hem adil e û hem jî daxwaza herî hêja ya rûmeta mirovan e.***



Delav
Feratê Dengizî

# Bahoz

Sih û du sal berê, şeveke wek îşev, saet derdora neh-neh û nîvan daketim îstasyona Mêrdînê, wargeha dilê bibêrî, cihê biewle... Rewîtiyek bibobelat, xweş û xetere ji Zelê ber bi vir ve qediyabû; de gidî jiyan!

**Lê bahozek dinê dest pê dikir!**

Erê em ê karê rêxistinî veşarî bikin û civakê bi her beşa xwe birêxistin bikin. Helbet mirin her gav li pişt stûyê me ye. Çar rojên me neqediyan, hêja Mehmet Sîncar û rêzdar Metin Ozdemîr hatin qetilkirin. Ev hişyarî û peyama dahatûyek man û nemanê, azadîparêziya bi rih û can bû. Ma azadîxwaz ji mirinê ditirsin! Bila em rêwiyê hêviyê bin, mirin sed carî li ser çavan. Lê divê em bijîn ku têbikoşin, li ber xwe bidin. Bê sekn û tebat, lê baldar. Bi erzanî terk-kirina qada şer tune ye. De gidî!


Tiştên ku bûn û qediyan bila malê dîrokê bin. Lê li pey me duwazdeh hevalên wenda man. Ne ins û ne cins, bêşop... Lê ew her di dilê me de ne û rênasên me ne. Em kujeran jî dizanin, tirsonekên dîrokî û rûreşên civakî jî! Em dizanin tolê bi rêxistinî û avakirina vîna kurdî, pêkhatina îradeya gelê kurd û hemû gelan bistînin... Bila dîrok vê jî bizanibe...

Va îro piştî sih û du salan li Qosera Mêrdînê li hizûra cangorî Mehmet Sîncar im. Em tev bi girseyî li hizûra wî û di kesayeta wî de li hizûra hemû cangorî û canfîdayan in. Bila dîrok vê jî bizanibe.

Li gel dilzîziya wenda, cangorî, hişberdan, xebatkar û xwedî xwîn û xwêdanan, wan em di kesayeta te de Mehmedê hêja bejna xwe li ber we ditewînin. Kêmasiyên xwe dibînin lê berxwedana xwe jî nîşan didin. Pêşî va dayik li vir in; kezebşewitî, dilsoj lê serbilind in. Bala wan di hizûra te de li çiya ye. Belê çima em kurd ewqasî ji çiya hez dikin Mihemedo... Gelo li wî alî bi cangoriyan re hûn civînan li dar dixin û nîqaş dikin nizanim! Lê dilê min wer dixwaze. Erê hûn jî çiyayî ne û ji çiyê hez dikin. Dayik dilbisebir û serbilind in; hizûr, hêvî, diltengî û xurura wan dide bîbikên çavên wan. Weleh ji te, ji we hez dikin. Îro li dewsa wan ez hebikî dilgiran im, divê azadî hê bêhtir bûya, lê ax... bila axa dil û axa qedîm bizanibe. Ma ne şairê Çalî Arjen Arî digot, “Kê negot ax û neçû, kî nebû ax û neçû...” îja dayik dilgorî ne hevalê min, dizanim bi tenê ew kenê te wan aş dike. Vaye îro em aştiyê dixwazin li ber dîwana te; bila dinya bizanibe ku kurdan çav bernedaye ax, namûs û keda kesî, lê hema hema kes nema ku ked û xwîna kurdan venexwar. Gazin, na bi berxwedêrî em bang dikin. Ev xak xaka haştiyê, aştiyê ye...

Siyastemedar, nûnerên saziyan, jin, kal, ciwan, zarok, malbat vaye em tev li hizûra we/te ne. Bibêjin û me bidarizînin, ev ji mafê we ye...

Dilxweş im ji aliyekî ve, hebikî bi lêhatin, an jî şans vaye li ber te me. Belkî rohnayiyek hêjatir parve bikim di demên bê de. Tiştekî dixwazim ji te; dikarî bipirsî ji Ferhatê çavşîn ê dilşewat; gelo xwe şewitandin, bedendana ber êgir çawa ye?! Çavî bi çavî helîn çi ye, çawa ye?! Ew dil, ew sebir û deyax ji ku hat! Bêje heyrano! Di ber re jî stran gotin, kilam xwestin... “Sewdaliyê....” Wele em sewdalî ne, carinan difikirim ku dê li ser rûyê dinyê kes vê sewdaya me fêhm neke... Roj dê bibiriqe, li pirs heta asîmanê heftan aliqiye..




Belê em sewdalî ne, bawer bike dilê min ji yê xortê çardehsalî bêhtir lê dide. Tê bîra te sohbetên li ber dikanê û hevdîtina dawîn li çiyayê azad, ew çi dilxweşî bû lo....

Lê asîman niha neheqiyê li min û te dike. De ka bibêje, min ji çi dest pê kir û em hatin ku; dilxweş be, li gel kêmanî, nezanî, kubarî û qiretî em rêxistinkirî ne, çê yan xerab. Lê bawer bike em ê awirên we bikin şewqa sedsalî, bibêje hezarsaliya dawîn a cîhanê... ji Zagrosan heta Toros û Rojavayê ceng û govenda azadiyê li dar e Delalo. Bila çavên we li pey we nemînin...

Divê rojê de wek diyarî dixwazim helebestekê diyarî giyanê te/we bikim, nexasim ji bo cangoriyê temenbiçûk ê dilçiya. De bi xatirê te... Li gel bêrî, dilbexşî û nûraniyan...

***Çengek ax dixwazim***
*Bi şewba evîna te ketime*
*çengek ax bi destê min nakeve*

*Ne ceban ne jî war*
*Bûm berate*
*Qevdek çilo dixwazim li ser*
*defa sînga xwe*
*bêhna çilo çi xweş e*
*nexasim yê şil, wek*
*bêhna te û welat diyarî*

*Herê xeraca Misrê ji min tê xwestin*
*giran e wiha dildarî*

*Tu pênc salî bûyî dest pê kir*
*Vê serboriya*
*Niha di çelî re bihurî*
*Hê jî didome*
*Dizanim tu baş î*
*Pir delal î*
*Bêriya te dikim*
*Car din hev bibînin*
*Emr û azadî*
*Bîra derdan Kurdistan*

*Rihan li ba we jî hene!?*

*Nizanim çima di vê jiyana*
*malkambax de mehzûnî*
*Melûlî bûye para me*

*Mirûstan min rihet nahêlin*
*Îsal*
*Gelo ji qencî ye!*
*Derd û kulan kat kat dan di dilan*
*Dijwarê me bê serî û berate çû*
*Bayê tehtê derman e*
*Êşbirê ji giyanî*
*Tê bîra te*
*Serbaniyê Bereşê*
*Awirzelaliya wê newalê*

*Ma ne du pace û deriyeke*
*Jiyana me*
*Lê her tije evîn û azadî*
*Her azad û dilşa me*
*Bi ferişte periyan re hevşadî*
*Hevşabûna efsûnî*

*Dildarî dil qijand*
*Bêriyê ew qemirand*
*Tariş em dan ber xwe*
*Ber bi abadînê ve*
*Dil û mêlak heşiya*

*Va wisa ye dilê min*
*Çiqas teht, lat û rizda dibînim*
*Dildiêş im*
*Zorevîn im*
*Bi bêrî me*
*Bi hêvî me*

*Çengek ax dixwazim*
*Rihan li ba we jî hene!?*

Em dilçiya, hêvîçiya û jiyanhez in Delalo, bahoz didome li gel berxwedêrî, aştîxwazî û şervaniyê...

# Hesasiyeta pêvajoyê nakokiyên navxweyî ranagre!

## Nakokiya di navbera AKPê ne tiştekî veşarî ye. Di navbera MHP û AKPê de jî hin pirsgirêk hene. Ev pirsgirêkên hanê dibe ku navxweyî bin lê bandorê li pêvajoyê jî dikin. Nakokî di manşeta Yenî Şafakê de jî diyar dibe



Serdar Altan



Tevgera Azadiyê gavên xwe yên dawî avêtin. Li ser daxwaza Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan biryara xwevekişîna ji Tirkiyeyê ji raya giştî ragihand. Biryarê li cîhanê gelek deng veda. Piştî daxuyaniyê bi taybet li Enqereyê di siyasetê de liv û tevgêrek berbiçav pêk hat. Daxuyanî li ser daxuyaniyê hatin dayîn. Di serî de sazî û dezgeyên demokratîk, kesayetên xuyayî û tevahiya raya giştî ya aştîxwaz ji bo ku dewleta tirk gavên şênber bavêje bang li hikumeta AKP-MHPê kirin.

Li gorî van geşedanan mirov dikare bêje ku êdî gavên yekalî yên ji hêla birêz Ocalan û tevgêra wî ve bêne avêtin nemane. Ango ji bo pêşîvekirina li pêvajoyê, aliyê kurd tişta ji destê wan hatî kirine.

Em bînin bîra xwe; destpêkê banga rêzdar Ocalan a 27ê sibatê weke manîfestoya serdemê bû. Piştî vê daxuyaniyê kongreya PKKê û biryara xwefesihkirinê, paşê jî merasîma çekşewitandina di 11ê tîrmehê de. Ev gavên hanê bi tevahî biryarên gelek girîng bûn û li tevahiya raya giştî ya cîhanê bi erênî hatin pêşwazîkirin.

**Xeteriya dirêjbûna pevajoyê**

Lê dewlet li gorî vê ciddiyetê tevnegeriya û pêvajo giran bi rê ve bir. Heta ji destê wan hat gavên ku wê bên avêtin bi paş ve xistin. Helbet di vê nêzîkatiyê de hin destên ji derve û rewşa Sûriyeyê jî diyarker bû. Lê ev ne dihat wê wateyê ku gav neyên avêtin. Ji ber ku aliyê kurd, di serî de jî ev hişyarî kir. Birêz Ocalan di her hevdîtinê de bal dikişand ser xeteriya dirêjbûna pêvajoyê. Proses(dem) her ku dirêj dibe ji bo destwerdana hin aliyên xêrnexwaz vekirî dimîne. Hêz û derdorên ku dixwazin pêvajoyê têk bibin pir in.

Di gel ewqas tengijînê jî birêz Ocalan careke din kete dewrê û ji bo rê lê vebike mudaxaleyê pêvajoyê kir. Wek gaveke dawî vekişîna gerîllayan hat rojevê. Rêxistinê jî ev yek pêk anî. Niha gok li qada dewletê ye. Wek gava yekemîn jî çav li rê bû ku komîsyona li meclisê ava bûye biçe girava Îmraliyê.

**Geşedanên girîng**

Hefteyên borî geşedanên girîng pêk hatin. 30ê cotmehê şandeya DEM Partiyê ya Îmraliyê û Erdogan li hev civiyan. 3yê mijdarê şande vê carê çû giravê û bi birêz Ocalan re hevdîtin kir. Heman rojê Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê îtîraza Tirkiyeyê red kir û biryara derbarê hevserokê berê yê HDP'ê Selahattin Demîrtaş de teqez kir. Roja piştî wê civînên koma partiyan hebû. Destpêkê serokê MHPê Devlet Bahçelî axivî û hem têkildarî çûna komîsyona meclisê ya ji bo Îmraliyê û hem jî ji bo tehliyekirina Demîrtaş gotinên erênî anîn ziman. Hevserokê DEM Partiyê Tuncer Bakirhan, serokên partiyên din û roja piştî wê jî serokê CHPê Ozgur Ozel jî derbarê mijarê de axivîn.

Mirov dikare bêje ku piraniya axaftinan û nêzîkatiyên derketin holê erênî bûn. Herkes çûna komîsyonê ji bo Îmraliyê weke gaveke girîng pênase dikir. Lê çavên herkesî li ser axaftina Erdogan bû. Erdogan derbarê çûna giravê de tiştek xuyayî neanî ziman lê piştgiriya Bahçelî kir. Her wiha ji bo berdana Demîrtaş jî biryara dadgehê îşaret kir.

Komîsyon, wê roja 6ê mijdarê biciviya û biryar ji bo hevdîtina bi birêz Ocalan re bigirta. Lê roja dawî ev civîn ji ber hin sedemên din hat taloqkirin. Çav li rê ye ku civîn vê hefteyê pêk bê.

**Komîsyon çima naçe Îmraliyê?**

Helbet wek rojnameger em hinek bi dû meselê ketin, da ku em fêm bikin gelo komîsyon ji ber çi ewqas xwe giran dike, an jî bê dil e. Li gorî hin agahiyan tê gotin ku di eslê xwe de komîsyon daxwaza wan a çûna giravê heye lê belê bi taybet endamên partiya CHP'ê û Yenî Yolê dixwazin ku misogeriyek, ango temînatek ji hikumetê hebe.

Ya rastî dixwazin ku Erdogan bixwe di vê mijarê de temînat bide. Dema tu ji wan dipirsî, mînaka pêvajoya 2013-2015 didin ku Sirri Sureyya Onderê di wê pêvajoyê de cih digirt ji ber vê mijarê hat darezandin. Helbet evqas bêcesaretî ne maqûl e, lê belê ji hin aliyan ve jî mirov vê rewşê fêm dike. Madem Erdogan û hikumeta xwe aliyek in û mesûlê vî tiştî ne, divê xwe bikin yek li ser vê mijarê. Gelo çareseriyê dixwazin an na? Ger dixwazin divê li gorî pêdiviyên wê tevbigerin.

**Nakokiya navxweyî**

Helbet li vir hin faktorên din derdikevin holê. Nakokiya di navbera AKPê ne tiştekî veşarî ye. Di navbera MHP û AKPê de jî hin pirsgirêk hene. Ev pirsgirêkên hanê dibe ku navxweyî bin lê bandorê li pêvajoyê jî dikin. Weke mînak; roja ku çûna komîsyonê ji bo Îmraliyê ewqas di rojevê de bû rojnameya nêzî AKP'ê Yenî Şafakê bi manşeta ***"KOMÎSYON BILA NEÇE ÎMRALIYÊ"*** derket. Herkes matmayî ma. Kifş bû ku rojname berdevkiya aliyekî di nav AKPê de dikir. Wek tê zanîn ku ev rojname ya Albayrakan e ku Beratê zavayê Erdogan jî ferdek ji vê malbatê ye.

Roja piştî wê rojnameya Turkgunê ku nêzî MHPê ye bi surmanşeta "DERDÊ WE ÇI YE?" derket û bertekeke mezin nîşanî Yenî Şafakê da. Rojname di sernav de her wiha anî ziman ku Yenî Şafak xwestiye ku derbeyê li pêvajoyê bide, lê bi hebûna arşîvan rezîl bûye.

**Pêvajo girîng û nazdar e**

Ev her du mînak didin xuyakirin ku hem di nav AKP'ê de hem jî di nav AKP û MHPê de nakokiyên kûr hene. Lê belê pêvajo ewqas girîng û nazdar e ku van nakokiyên navxweyî ranagre. Weke me di destpêkê de anî ziman, bi vê halî pêvajo ji destwerdanê re vekiriye. Rêzdar Ocalan di her fersendê de balê dikişîne ser vê yekê. Bi taybet ajandayên Îngilîstanê û Îsraîlê li ser vê mijarê tên zanîn. Ew dixwazin li gorî xwe teşe bidin pêvajoyê. Rêber Ocalan bi feraset û pêngavên xwe van daxwaz û lîstokan pûç dike. Lê belê ger were qonaxek jêneveger, wê demê kes nikare pêşî li hin tiştan bigire. Ev yek ji tu kesî re ne xêr e. Bi taybet jî ji bo hikumeta AKPê û dewleta Tirkiyeyê.

# Pîvanên qonaxa pozîtîf çi ne?

Xweşkanî
Felemez Ulug



Heyeta DEM Partî ya Îmraliyê hefteya borî bi Rêber Apo re hevdîtin pêk anî. Naveroka hevdînê bi peyamekê ji raya giştî re aşkere kir. Yek ji mijarên zêde derket pêş û bal kişand ser xwe, nirxandinên Rêber Apo yên ji bo pêvajoyê û tespîtên derbarê qonaxa pozîtîf de bûn.

Rêber Apo, bi qonaxa pozîtîf, îşaret bi pêvajoya çareseriya pirsa kurd ji merheleyeke taktîkî ya rawestandina şer, ber bi merheleyeke stratejîk a avakirina sîstema nû ve dibe. Ev dabeşkirin, ku di lêkolînên aştiyê de xwedî cihekî girîng e, dihêle ku em gavên hatine avêtin û pêwîst e bên avêtin, analîz bikin.

Aştiya negatîf ne armanca dawî ye, lê şertê pêşîn ê çareseriya siyasî ye. Pênaseya wê ya bingehîn "tunebûna şerê çekdarî" ye. Agirbest, bidawîanîna şêweyê têkoşîna çekdarî, şewitandina çekan û vekişîn, hemû bi hev re nîşan didin ku aliyekî sereke yê pêvajoyê bi awayekî yekalî û radîkal dev ji amûra têkoşîna çekdarî berdaye.

Lê di vê pêvajoya hessas û krîtîk de dem bi dem dewleta tirk li bakurê Kurdistanê liv û tevgerên xwe yên eskerî dewam kirin. Ev yek nîşan dide ku dewleta tirk di vê qonaxê de "pêwîstiya diyalogê" negirtiye ser xwe. Aştiya negatîf, bi awayekî sereke, bi fedakariya aliyekî ve tê birêvebirin. Bi vî awayî, qonax bi temamî bi dawî nebûye. Ji ber ku berpirsiyariya rawestandina şer a dualî bi awayekî zelal nehatiye bicihanîn.

Merasima şewitandina çekan li şikefta Casenê, di dîroka tevgera çekdarî de gaveke dîrokî û biryara ragihandina veguherîna siyasî ye. Ew veguherîna ji merheleya leşkerî ber bi merheleya siyasî û demokratîk ve dide nîşandan. Aştiya negatîf, her çendî "gavên pir mezin" bin jî, tenê dikare "lihevkirineke demkî ya bêşer" pêk bîne. Ji bo çareseriyeke esasî, divê ber bi qonaxeke kûrtir ve biçe. Aştiya pozîtîf tê wateya tunebûna sedemên bingehîn ên şer û hebûna edaleteke civakî, siyasî û aborî. Ev qonax xwedî pênaseya jinûve-înşakirina têkiliyên civakî ye.

Edaleta veguhêz ango tanzîmkirina edaletê, di vê merheleyê de, ne tenê cezakirin, her wiha rûbirûbûna rastiyê pir girîng e. Afrîkaya Başûr ev qonax bi avakirina Komîsyona Heqîqet û Lihevkirinê bi rê ve biriye. Komîsyona ku bi awayekî serbixwe û bê alî kar kiriye, ne tenê şer rawestandiye hiştiye ku maxdûrên şer jî ji vê pêvajoyê sûdê werbigirin. Lewma îro ev pêvajoya serketî di dîrokê de wek mînak tê dayin.

Yek ji sedema bingehîn ên pirsgirêka kurd, siyaseta înkar û tunekirina nasnameyên çandî û neteweyî ye. Di qonaxa pozîtîf de, naskirina wan nasnameyan bingeha herî sereke ya ji bo bidawîkirina şer e. Bêyî vê naskirinê, aştî pêk nayê û daxwazên bingehîn ên gelên herêmê jî pêk nayên. Di vê mijarê de pênaseya Rêber Apo ya pêvajoya bihevre-veguherînê girîng e. Ev pênase nîşan dide ku çareserî ne peymaneke "teslîmbûnê" ye, lê veguherîneke dualî ye.

Di vê çarçoveyê de lihevkirina aliyan tê wateya erêkirina pergaleke siyasî ya nû. Di vê pargalê de ne tenê daxwazên aliyê kurd û dewletê, yên hemû pêkhatiyên herêmê esas tên girtin. Lewma ev lihevkirin dê bibe destûreke bingehîn a nû. Di vê serdemê de, diyalog û muzakere amûrên sereke ne. Muzakere ne tenê di navbera rayedar ango berpirsên leşkerî û siyasî de, di demê de, di navbera hêzên civakî de jî pêwîstiyeke girîng e. Ev yek nîşan dide ku hêza civakî di pêvajoyên wisa de dibin aktorên sereke. Lewma weke Rêber Apo di banga xwe ya Aştî û Civaka Demokratîk a 27ê Sibatê de dibêje, ev pêvajoya aştiyê wê li ser pirensîbên bingehîn ên civakî û demokratîk bê meşandin.


Yek ji hîmên sereke yên banga Rêber Apo ji bo çareseriyê "Entegrasyona Demokratîk" e ku vê weke rêya herî maqûl destnîşan dike. Ev model ne cudabûn, lê di nav komara demokratîk de parvekirina hêza civakî û demokratîk esas digire. Rêber Apo di manîfestoya xwe ya Aştî û Civaka Demokratîk de vê di bin 7 sernavan de bi berfirehî hewcedariyên wê datîne holê.

Lê ji bo bi silametî ev pêvajo bi rê ve biçe pêwîst e ku di çarçoveya hin xalên sereke de demildest gav bên avêtin. Li ser banga Rêber Apo, Tevgera Azadiya Kurdistanê erk û berpirsyariya dikeve ser milê wê bi kongreya xwe 12emîn a PKKê û biryarên kongreyê aşkere helwesta xwe nîşan da.

Piştî kongreyê gavên ku hatine avêtin jî nîşaneya vê helwestê ne. Lê ev pêvajoya wisa diyar e ku bi yekalî naçe serî. Ji bo wê jî "Înşakirina Baweriyê" weke pêwîstiyeke vê qonaxê derdikeve pêş. Di vê qonaxê de, çalakkirina mekanîzmayên şefafiyetê û garantiyên qanûnî yên baweriya ji bo pêvajoyê wê xurttir bike.

Divê Veguherîna Civakî û Sazûmaniya Dewletê ji nû ve bê nîqaşkirin û li gorî berjewendiyên civakê bê avakirin. Her wiha sazîbûna sîstemeke nenavendî ku rêveberiya herêmî ya ku li gorî rastiya pêkhateyên herêmê nas dike, bê avakirin. Naskirina çand û nasnameyan jî yek ji hîmên herî sereke ya komara demokratîk e. Ev yek li ser hîmê rêzgirtina qanûnî ji bo ziman, perwerde û temsîliyeta siyasî ya gelan e. Di halê heyî de pir aşkere ye ku pêkanîna vê yekê bêyî reformeke destûrî ne pêkan e.

Di çarçoveyê de pêwîstî bi reformên hiqûqî û destûrî jî hene. Pêwîst e ku xalên destûrî yên ku tevahiya netewe û nasnameyan tenê wekî tirk bi nav dikin, li gorî prensîbên civaka demokratîk û wekheviya pêkhatiyên di bin sîwana komara demokratîk de xwe temsîl bikin, bên sererastkirin. Bi vê yekê welatîbûna demokratîk û wekhev dikare bê avakirin.



Dîsa dikare berfirehkirina qada siyasî jî bê nirxandin. Divê bi yasayên nû pêşî li beşdariya kesên çekên xwe şewitandin bê vekirin ku ew bikaribin di qada siyasî de xwe îfade bikin. Ger ev kes di zemîneke meşrû de bikaribin xwe li qadên cuda ên civakê îfade bikin, wê ev yek ji bo silametî û pêşxistina vê pêvajoyê jî bibe gaveke erênî.

Li gorî vê yekê, em dikarin pêvajoya pozîtîf weke "înşakirina aştiyê" bi nav bikin. Ev pêvajo li hin welatan zû bi encam bûye. Lê li welatên wekî Tirkiyeyê ku nakokî gelek in û siyaseta înkarê xurt e, demek jê re lazim e. Bêguman, pîvanên serkeftina vê pêvajoyê, Rêber Apo gelek caran bi peyamên xwe bi raya giştî re parve kirin. Pîvana sereke ew e ku ev pêvajo bi tevlîbûna civakê dikare bigihîje armanca xwe ya bingehîn. Civak bi rêxistinkirina xwe, bi israra li ser mafên xwe yên demokratîk û bi parastina qada siyasî ya aştiyane, hêza sereke ye ku pêvajoyê bi pêş bixe û bigihîne serî.



Ramazan Olçen

## Ne asîmîlasyon, entegrasyon

Komara Tirkiyeyê hebûna xwe li ser înkar û qirkirina kurdan û tevahî gelan ava kir. Lê bi saya têkoşîn û rêwîtiya zêdetirî 50 salî ya Apoyî ev siyaset derbeyên mezin xwarin. Hebûna kurd weke realîteyekê ji salên 90î ve di rojeva Tirkiyeyê de ye. Salên dirêj e ku çareseriya pirsa kurd li rojevê ye. Lê her carê pêvajo xitimî û ev jî bû sedema kûrbûna şer, mezinbûna azaran. Sedema xwe ya esasî ya xitimînê jî ew bû ku di çarçoveya siyaset, ewlehî û qanûnan de pirs dixistin çembereke teng.

Lê pirsa kurd ji ber piralîbûna xwe û kûrbûna xwe di wê çemberê de hilnedihat. Niha bi cotmeha 2024an ve û piştî banga rêber Apo ya 27ê sibatê, di lêgera çareseriyê de li ser tiştеke din tê axaftin.

Entegrasyona Demokratîk, zimanê aştiyê yê vê dem û wextê ye. Hedefa wê ew ku kurd bên nasîn û tevlîbûnê bi pêvajoya demokratîkbûna Tirkiyeyê re bike yek. Bi kurt û kurmancî, entegrasyona demokratîk ew e ku gel bêyî ku hebûna xwe deyne aliyekî, dibe parçeyek birûmet yê yekîtiyekê.

Wateya wê ji bo kurdan jî ev e: ne bi veqetîn û cihêbûnê lê bi nasname, çand û zimanê xwe bi pêkhayetên din re, li ser zemîneke adil û wekhev înşakirina jiyanê. Lê entegrasyona demokratîk tenê daxwazeke civakî jî nîne. Her wiha ew bangeke ji bo ramaneke nû ye jî. Mîmarê vê fikrê jî rêber Apo ye. Rêber Apo entegrasyona demokratîk yek ji têgînên esasî yên 'Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk' pênase kir. Li gorî ku ew pêşniyaz dike, entegrasyon nayê wê wateyê ku civak bi dewletê re bibe yek. Naxêr, ew dibêje ku bi civaka demokratîk wê komara demokratîk bê avakirin.

Ji bo fêmkirina vê jî divê em biçin hevdîtina 28ê tebaxê ya heyeta DEM Partî ya Îmraliyê ku bi rêber Apo re kir. Hingê rêber Apo got; hêza avakar a entegrasyonê civaka demokratîk e.

Di modela rêber Apo de civak pasîf û tebatî nîne. Di nav lebat û tevgerê de ye û ew ava dike. Dewlet jî gotin li cî be, li gorî vî avakarê demoratîk ji nû ve bi sazûman dibe. Gelê kurd ê ku ev zêdetirî sed sal in nasname, ziman û çanda wî tê înkarkirin, bi saya entegrasyona demokratîk hebûna xwe ya azad didomîne.

Li vê derê ya esas tê girtin, cudarengî nabin sedema veqetîn û cihêbûnê. Cudareng yekîtiyeke rengîn ava dikin. Rêber Apo dixwaze bi entegrasyona demokratîk civaka demokratîk entegreyî komara demokratîk bike. Bêguman ev ne têkçûn û teslîmiyet e. Weke ku hin derdor îdia dikin, ev asîmîlasyon û helandin jî nîne.

Hevnaskirin û pêvajoya ji nû ve înşa û sazûmaniya komarê ye. Ji ber wê tevî ku entegrasyona demeokratîk di civaknasiyê de weke têgîneke nû bê dîtin jî, ev jî têgîneke siyasî civaknasî wêdetir li ser veguherîna civak û dewletê pêşniyazek e. Aliyekî din ê entegrasyona demokratîk jî, naskirina mafên gelê kurd ên çand û zimanî ne. Kurdî ji perwerdehiyê heta bi xizmetên cemaweriyê di hemû qadên jiyanê de xwe heyî dike. Pê re înkara bi rêya zimanê gelê kurd jî ji holê radibe. Gelê kurd jî hingê xwe weke parçeyekî ji komara demokratîk dibîne û ev têkilî xurt dibe.

Weke ku rêber Apo pênase dike li dijî asîmîlasyonê ew li ser zemîna wekhev tanzîmkirina jiyana nû ye. Di heman demê de, ev pêşniyaz ji bo gel û pêkhateyên Tirkiyeyê giş tê wateya peymaneke nû ya civakî.

Rêber Apo bi entegrasyona demokratîk modeleke nû ya çareseriyê datîne holê ku tê de hem mutabaqata siyasî hem jî jê wêdetir veguherîna civakî heye.

# Rontgena dilsoziya dewletê

**PKK xwe fesih kir, çek şewitandin, lê dewlet û desthilatdariyê gavên pêwîst neavêt. Pêvajo xitimî, dîsa ji bo selametiya pêvajoyê bi erêkirina birêz Ocalan gerîla xwe ji Tirkiyeyê vekişand û rê vekir**



Cahîd Kirkazak



Di van rojan dawîn de li Tirkiyeyê geremoleke ecêb heye. Hema bêje her roj di derheqê şaredariyên CHPê de dozên nû tên vekirin, di derheqê Îmamoğlu de doza sexurtiyê hat vekirin. Qeyûm hat avêtin li ser televîzyona Tele 1ê, şeş rojnameger hatin binçavkirin. Li hêla kurdan jî li parlamentera berê ya HDPê Semra Guzel 8 sal û 9 meh ceza hat birîn, li Agiriyê li siyasetmedarên kurd ceza hatin barîn, di derheqê 7 rojnamegerên çapemeniya azad de Îstinafa Enqereyê cezayên ku hatibûn birîn erê kir. DMME di derheqê biryara Selahattîn Demirtaş de serlêdana Tirkiyeyê red kir, li hêla din jî PKKê bi merasîmeke çapemeniyê daxuyaniyek da ku biryara vekişandina çekdarên xwe yên li Tirkiyeyê girtiye. Niqaşên pîrozbahiya damezrandina komarê ya 29ê cotmehê, encamên hilbijartinên Kibrisê, naqoqiyên di navbera AKP û MHPê, agirbest û qaşo aştî di navbera Îsraîl û Hamasê û hwd.

Lê tiştê herî giring ê ku pirsgirêka demokrasiyê li Tirkiyeyê û Rojhilata Navîn çareser bike, li Tirkiyeyê pêvajoya aştî û civaka demokratîk, li Sûriyeyê jî hevdîtinên di navbera rêveberiya xweser û Şamê de civak tê ewarekirin û tê xwestin ku bala civakê li ser van mijaran bê vekişandin. Di pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de demek zêde li benda gavavêtina desthilatdar û dewletê ye. Ji ber ku qonaxa yekem qonaxek avakirin ji holê rakirina îhtimale şer. Pevçûnan û provokasyonan bû; ji ber wî jî di ceribandinên pêvajoyên şer û çareserkirinê de tiştên ku nehatine kirin bi însiyatîfa birêz Ocalan hatin kirin.

PKK xwe fesih kir, çekên xwe şewitandin, lê dewlet û desthilatdariyê gavên pêwîst ên bersivdana van geşedanan neavêt. Pêvajo xitimî, dîsa ji bo selametiya pêvajoyê bi erêkirina birêz Ocalan PKK çekdarên xwe yên li Tirkiyeyê vekişand. Li ber hemû van geşedanan mixabin komîsyona ku li meclisê hatiye avakirin hên jî bi birêz Ocalan re hevdîtin nekiriye, hê jî niqaşên bi hevdîtina birêz Ocalan re neqediyaye ku bi ya min ev pirsgirêk û kêmasiyek gelek mezin e. Ev helwest di heman demê de rontgena dilsoziya dewlet û desthilatdarê ji bo pêvajoyê nîşanê me dide. Xeyn ji avakirina komîsyona bê bandor a meclise, tu gavek pêwîstiyên civakê nehatine avêtin. Ne di derheqê hêmanên hêviyê de zagon hatin derxistin, ne di derheqê girtiyên nexweş û yên ku cezayên xwe kedandine de zagon hatin derxistin, ne operasyonên siyasî yên li ser siyaseta demokratîk û CHPê hatin sekinandin, ne keyum hatine vekişandin, ne ji bo gerîlayên PKKê yên ku çek danîne beşdarbûna siyasî û huqûqî ya civakê zagon hatin derxistin.

Ji bo hemû van pirs û niqaşan dewlet û desthilatdar bi tenê bersiva 'amadekarî tê kirin' didin. Li amadekarî çi ne, naveroka amadekarî çi ye ne civak ne jî muxatabê pêvajo yê ne serwextin. Ev tê wê wateyê ku dewlet û desthilatdar ji xetereyên xwe yên berê ders ne girtine. Xetereyên herî sereke jî ew e ku amadekarîyên pêwîstiyên pêvajoyê bi serê xwe dikin. Ji ber ku ceribandinên pêvajoyên çareserkirinê nîşan didin ku pêvajoyên çareserkirina pirsgirêkên civakê bi rêbaza demokrasiyê û bi hevkariya muxataban re tê çareserkirin. Li dewlet û desthilatdariyê 'ku hebin' xebat û amadekariyên xwe bê beşdarbûna civakê bê hevkariya muxatabên xwe dikin. Ev xetere dema pêvajoya 2013 û 2015an tîne bîra me.

Lê hêla din jî hevdîtinên di navbera rêveberiya xweser û rêveberiya demkî ya Şamê heta astekê hat û sekinî. Li gorî daxuyanî û agahiyên ku berpirsiyarên hevdîtinan; HSD û Şam di hinek mijaran de li hev kirine lê ev li hev kirin jî ber bandorên dewletên herêmî bi nivîskî nehatine nexşkirin, bi tenê li ser devkî man e. Em dizanin ku bandora Tirkiyeyê li ser hevdîtinên Şamê gelek zêde ne. Midaxeleya Tirkiyeyê li Sûriyeyê li ser dijbertiya kurdan e. Ev helwesta dijbertiya li hember kurdan; ne ji Tirkiyeyê re, ne ji kurdan re ne jî ji Rojhilata Navîn re feyde nine, zirar e. Ji ber vê jî divê Tirkiye demek zû li navxweyî de, li Rojhilata Navîn û li heman dere cîhanê dest ji polîtîkayên dijbertiya kurdan berde. Û gavên pêwîst ên pêvajoya aştî û civaka demokratîk biavêje, li Sûriyeyê jî rezdarî nîşan bide ji bo mafê xwerevebirina kurdan. Ji ber ku ev sedsala dawî û geşedanên ku pêk hatine nîşanê me dane ku bê çareserkirina mafê xwerevebirina kurdan li Rojhilata Navîn aramî û aştî ne pêkan e. An bi rêbazek demokratîk mafê xwerevebirina kurdan bê çareserkirin an jî geşedanên Rojhilata Navîn cuda xwe dide ferzkirin. Wekî ku birêz Ocalan jî dibêje: 'Kurd ê dî ne bê vebijêrkên.'

Peşniyareke û gotineke min jî ji partiyên siyasiyên muxalefet, rewşenbîr, rojnameger, bawermend û demokratên Tirkiyeyê re heye.

Bile baş bê zanîn ku pirsgirêkên demokrasiyê yên Tirkiyeyê û mafê xwerevebirina kurdan ji bo bi çareseriyeke mayînde bibe divê di serî de rola Abdullah Ocalan a di pêvajoyê de bê dîtin. Ji bo azadbûna fîzîkî, siyasî û hiqûqî a birêz Ocalan biryara DMME ya ku di derheqê Ocalan de hatibû dayîn ango biryara 'mafê hêviyê' ku Ocalan vê biryarê wekî 'hêmanên hêviyê' binav dike xwedî were derketin. Ji ber ku heta çareseriyeke mayînde neyê avakirin û Ocalan azad nebe hemû girtiyên siyasî azad bibin jî ew ê xebatên xwe yên azadî û demokrasiyê bidomînin û ew ê dîsa werin girtin. Lewma divê di serî de MHP, CHP û hemû partiyên siyasî yên muxalif, rojnameger, rewşenbîr, sosyalîst, bawermend û demokrat, ji bo 'hêmanên hêviyê' ango 'mafê hêviyê' û azadbûna Ocalan bangawazî li dewlet û desthilatdarê bikin û gavên siyasî, huqûqî û zagonî bavêjin.

# Azadî bi rêxistinbûnê pêkan e

Xeyrî Welat Serhed

Em di serdemeke welê kambax de dijîn ku hema bêje civak di her warî de ji hêla pergala kapîtalîzmê ve hatiye dorpêçkirin. Di warê hest û remanê de tevizîn û rizandinek xwe dide der. Kesayetiya ku bi fikir û feraseta pergala heyî tev digere; em mijûliya bi pirsgirêkên civakî re deynin aliyekî, nikare pirsgirêkên xwe yên tekakesî jî çareser bike. Di halekî wisa kambax de ye ku qet ne di ferqa kapê (ben) di stûyê xwe de ye. Di destê pergalê de hepis bûye, ev pergala bêexlaq bi ku ve bixwaze bi wî alî ve dibe û tîne.

Kesayetiya heyî wer apolîtîk, nezan û nexwendî ye ku nikare lîstikên pergalê şîrove bike. Di warê fikir û remanê de tekakesiyeke kûr û hûr dijî. Li hemberî hemû pirsgirêkên civakî, bûye rebenekî stûxwar û belengaz. Mirov ti moral û motîvasyonê jê nagire. Hema bêje "Ewlad be jî nayê hezkirin."

**"Piçekî namûsa civakî û ked divê"**

Ev serdema ku em tê de dijîn her çendî di gelek waran de aliyên xwe yên neyînî yên ku me bal kişandin ser hebin jî, gelek aliyên ku mirov ji bo pêşiya xwe bibîne û pêşî li van xetere û rizandinan bigire jî hene. Berî her tiştî têkoşîneke me ya azadiyê ya xwedî felsefeyeke kûr û divê bi tîpên zêrîn bên nivîsandin heye. Fikir û felsefeya Rêber Apo û Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê di her warî de rêber e, ji bo kesayetî û civaka azad xwedî bîreke qedîm e. Di warê felsefe, dîrok, çand, ziman, huner û bi hezaran tiştên din de, rêzan e. Lê heke em xwe lê bigirin û hest û remanên xwe bi vê çavkaniyê av bidin, em ê serkeftinên mezin bi dest bixin. Ji bo vê Rêbertî dibêje, "Tenê piçekî namûsa civakî û ked pêwîst e."

**Weke keftarên devbixwîn**

Her ku dijmin polîtîkaya xwe ya şerê taybet li ser civaka me dişidîne, dorpêç dike, di warê hest û remanê de jî civakê dirizîne. Gelê me li her derê di dorpêçê de ye. Dorpêça li bakurê Kurdistanê bi sedan sal in didome. Bi polîtîkaya pişaftin, koçberiya li bajarên Tirkiyeyê û her dera cîhanê, rewşa kesayetî û civakê kambaxtir dike. Berî her tiştî birçî dihêle, gav bi gav pişaftinê bi pêş dixe, ji hişmendiya neteweyî û nirxan dûr dixe, hemû têkiliyên wan ên rêxistinî qut dike. Di warê manewî de ne malbatê dihêle, ne civakê û ne jî kesayetiyeke exlaqî û polîtîk dihêle ku tu bi serbilindî lê mêze bikî. Ev êrişa dijminane li dijî saziyên demokratîk hêj bi awayekî ziravtir dimeşe. Rêbaza xwe ya "hiqûqê" li dijî saziyan bê sînor bi kar tîne. Hiqûqa heyî ya dewletê peywira xwe bi awayekî hovane pêk tîne û wekî keftarekî devbixwîn e. Keftarek bi çi şêwazê nêzîkê nêçîra xwe dibe, dewlet û hiqûqa wê jî bi wê şêwazî nêzîkê civak û saziyên demokratîk ên civakî dibin.

**Li dijî şerê taybet çi pêwîst e?**

Di çarçoveya nirxandinên me de tişta ku herî zêde pêwîstî pê hatî dîtin, bêguman aliyê civakê yê rêxistinkirinê ye. Heta ku civak bê rêxistinî bimîne, ne kesayetî dikare ji tora dijmin derbikeve, ne jî civak dikare azad û rizgar bibe. Civaka bê rêxistin wekî masiyê ji avê derketî ye. Birçîbûnî jî, belengazî jî, pişaftinî jî, mêtingerî jî û her cure nexweşî jî dê bibin para civak û kesayetiya bê rêxistin. Tu kedkar bî, divê tu li dijî taşeron û patronan xwedî sendîka bî ku keda te neyê xwarin; tu jin û ciwan bî, divê tu xwedî rêxistin bî ku dewlet çanda pişaftin, bikaranîn û tecawizê li te ferz neke; tu xwezaparêz û sewalparêz jî bî, rêya ku vê parastinê bi pêş bixe û êrişên dewletê bide sekinandin, di rêxistinbûnê re derbas dibe. Ji bo vê hêj gotina Rêbertiyê ya "Bêyî partîbûnê (rêxistinbûn) li Kurdistanê pel jî naleqe" her tim giringiya xwe diparêze û dê her tim jî biparêze.

**Rêhevaltî û kesayetiya sosyalîst**

Jixwe Rêbertiyê di peyama xwe ya ji bo ciwanên meşiyan Amarayê de jî bi şênberî danîbû holê ku divê kesayetiya sosyalîst çawa be. Ev peyam ne tenê ji bo ciwanan e, di heman demê de, ji bo saziyên demokratîk, jin, ciwan û hemû civaka demokratîk e. Rêhevaltiya rast û sosyalîst di hemû beşên civakê de rêxistinbûnê li ser me ferz dike. Ev rê û meş, bi t, awayî bê rixistinbûn nabe, divê em ji tekakesiya kûr birevin û ked û xwêdana xwe tevlî hemû xebatên avakirina civaka demokratîk bikin. Ji ber wê ji hemû demê zêdetir divê em ji çanda qedîm a parvekirin û rêxistinbûnê sûdê bigirin, hestên xwe qayîm bikin, bi rêhevaltiyeke qedirbilind meşa xwe ya azadî û serkeftinê tacîdar bikin. Ev meş dê di serî de tecrîd û hemû êrişên dijmin pûç bike û me bi şeveqên azadiyê û civaka exlaqî û polîtîk de şiyar bike.

# 2 îmzeyên veşarî

**Bi şewazeke veşarî, ji bo êrişî Iraqê bikin û desthilatiya Seddam birûxînin, peymanek îmze kirine; ev, îmzeya yekê ye. Erê, her çend weke ku dixwestin pêk nehat jî, lê dîsa jî Receb Erdogan çi ji destê wî hat destek da DYAyê**

Ahmet Aktaş



Li gorî ku tê gotin, Receb Erdogan li gel DYAyê du caran peymanên bi dizî/veşarî îmze kirine! Berî destwerdana Iraqê Buch, Receb Erdogan ji 'zindanê' derxist, kişand Washingtonê û mîna serokkomar li ser xalîçeyên sor ew pêşwazî kir.

Hat gotin ku wê wextê, bi şewazeke veşarî, ji bo êrişî Iraqê bikin û desthilatiya Seddam birûxînin, peymanek îmze kirine; ev, îmzeya yekê ye. Erê, her çend weke ku dixwestin pêk nehat jî, lê dîsa jî Receb Erdogan çi ji destê wî hat destek da DYAyê, ji bo destwerdan û rûxandina rejîma Seddam.

Sedemên pêknehatina desteka DYAyê, ji ber ku projeyek wan a lezgîn derket pêş ji bo rûxandina Seddam, lewma têra xwe amadekarî nehatibû kirin, bi lez û bez Erdogan kişandin Koşka Spî. Sedema dudan jî dijberiya Deniz Baykal ê CHPî bû ku nehişt tezkereya li parlementoyê were pejirandin, ji ber vê helwestê çi anîn serê Baykal tê zanîn.

Di heman demê de Bush, Receb Erdogan weke cîgirê xwe, yan jî weke serokê duyemîn ê Projeya Rojhilata Navîn a Mezin ragihand. Erdogan, bi vê navdariyê û erkdariyê gelek kefxweş bû û hema hema heta niha jî pesindariya vê navdanê û erkdanê dike! Ka ji bo îmzeya duduyan gelo dê Trump çi nav li Erdogan bike? Îmzeya duduyan jî, li dijî Îranê ye, ji bo ku mîna Seddam destwerdana Îranê jî bikin û tê gotin, vê carê jî bi dizî lê bi Trump re peyman îmze kiriye!

Li aliyê din, tê dîtin ku DYAyê, amadekariyên gelek mezin dike ji bo êrişa li ser Îranê, ji ber ku jî kêmayiyên xwe yên di amadekariyên ji bo rûxandina desthilatiya Seddam de derketin holê dersan derdixe.

Amerîka li Hewlêrê, konsolxaneya xwe ya herî mezin a li cîhanê û xwedî hêza piralî ava kiriye, her wiha tê gotin ku karê xurtkirina mezintir a konsolxaneyê dewam dike. Li gel vêya li Qibrisê jî, di heman çarçoveyê de amadekariyên lezgîn dike, bi taybetî jî girîngiyê dide mezinkirina baregehên leşkerî û nexasim sîstema parastina hewayî. Bêguman van hewldanên DYAyê, hem Tirkiyeyê nerihet dikin û hem neçarî pejirandina biryardayîna şêrê li dijî Îranê dike.

Li Sûriyeyê jî, bi rêya Colanî hêza xwe ya heralî xurt dike û hema hema bi tevayî dixe bin bandora siya Israîlê. Her wiha li vê herêmê, hewl dide ku hemû pêkhateyan jî bike hevalbendên xwe; ne tenê durzî, elewî, suryan û hwd. Belê bi bingehîn têkilî û peywendiyên DYAyê yên li gel kurdan, desthilatiya Erdogan ditirsîne.

Gumaneke xurt heye ku li pişt perdê, wan aşkere hişyar dike û dibêje; "Heke hûn li gel me bi hemû hêza xwe nekevin şer, em weke cara berê ya li dijî Seddam bi qîma xwe ne û heke hûn nekin, va ye hêza hêrî xurt û birêxistin li vê herêmê kurd in û weke hûn dibînin jixwe têkiliyên me xurt in, lê vê carê heke hûn daxwazên me qebûl nekin, em ê li gel kurdan peymana bingehîn îmze bikin" û hwd.

Jixwe alternatîfeke gelek berfireh jî bi xurtî amade dike; bi navê peymanên Brahîmî, Îsraîl û hema hema hemû dewletên ereb gihandin ba hevdu, li gel vêya giranî daye ser xurtkirina têkiliyên Îsraîl, Qibris û Yewnanistanê jî.

"Dostê Receb" Trump, dost û birayê wî Îlham Eliyev û Paşînyan jî, ji dest wî kişand anî cem xwe! Dema ku xurtkirina têkilî û peywendiyên bi kurdan re jî dikeve ser van hevpeymanan, êdî cih li dewleta tirk bi temamî tengav dibe; ya wê daxwazên DYAyê qebûl bike ya jî bi tenê, bêkes û bêmiras li meydanê şût tazî dimîne!

Daxuyaniya Bolyozê DYAyê yê Iraqê yê kevn Zalmay Xelilzad jî dibêje; ''Lazim e DYA destekê bide daxwaza federalîzma kurdên Rojava'' û her wiha pesnê HSDê jî dide.

Îcar xwedêgiravî ji bo çareyekê ya jî heke nav lê bibe, alternatîfa hêzên li jor peyda bike Hakan Fîdan, bi vir û wir de baz dide û qaşo lez daye trafîka diplomasiyê.

Jixwe lingekî wî li Enqereyê ye, yê din jî li Şamê ye. Her wiha 3yê mijdara 2025an, bi lez wezîrên karûbarên derve yên 6 dewletên herêmê Qeter, Siûdî, Urdin, Mîregtiyên Yekbûyî yên Ereb, Pakistan û Endonezyayê kişandin Tirkiyeyê û di bin serokatiya xwe de, civînek şowmenî li dar xist.

Li aliyê din Trump, weke ku êdî dev ji 'aştiyê' berdabe û êdî dest bi karûbarên şer kiriye. Li gorî tê xuyakirin, ew taktîka wî ya 'aştîxwaziyê' nemeşiya, dîsa vegeriya ser 'eyarê xwe yê berê' û dest bi zimanê şer û cengê kir.

Geh dibêje 'ez ê êrişî Madûrêyê Venezuellayê bikim', geh dibêjê 'ez ê êrişî Endonezyayê bikim' û navên hinek dewletên din jî dijmêrê. Herî dawî jî navê Îranê ji devê wî derket. Wisa xuya dibe ku Trump, destwerdana Îranê xistiye rojeva xwe ya sereke û belasedem Erdogan wisa li rex xwe nade rûniştandin û dîmen û wêneyên hevpar nade. Dibe ku temenê Erdogan têra îmzeya 3yan neke, lê heke li gel kurdan rast bimeşe, dibe ku şansek wî çêbibe!

---

War Botan

# Hişê çêkirî/AI û rastiya jiyanê

Hişê çêkirî (Artificial Intelligence- AI) di jiyana me ya rojane de roleke mezin dilîze. Ji asîstanên dengî yên mîna Sîrî û Alexa bigire heta chatbotên mîna ChatGPT û Grok, ev teknolojî di warê agahdarî, alîkarî û sohbetê de gelek sûdewer in. Lê belê, tevî pêşketinên mezin, hişê çêkirî/AI hîn jî bi pirsgirêkên micid ên weke hevnegirtina mantiqî û şaşiyên di bersiv û sohbetan de rû bi rû dimîne. Armanca vê gotarê ew e ku em bizanibin bê ka AI çawa dixebite û çima car caran şaşiyan dike, da ku em bikaribin bi awayekî baştir pê re têkiliyê deynin û sûdê jê werbigirin.

**Şaşiyên di bersiv û sohbetên AIê de**

Hevnegirtina mantiqî di AIê de tê wê wateyê ku bersivên AIê yan jî sohbet bi awayekî li dijî qaîdeyên mantiqî yan jî rastiyên cîhanê ne. AI bi gelemperî li ser bingeha modelên fêrbûna makîneyê (machine learning) tên avakirin ku bi milyonan daneyan tên perwerdekirin. Lê belê, ev dane car caran şaş an ne temam in û ji ber ku makîne/model jî weke mirovan nafikire şaşiyên mantiqî peyda dibin. Bêguman, şaşiyên AIê ne tenê hevnegirtin in. Li jêr hin ji wan ên sereke tên ravekirin:

***1. Hallucinations (Xeyalên çêkirî):*** AI agahiyên şaş çêdike ku wekî rast xuya dikin. Mînak, ger bipirse, "Kî serokê Amerîkayê yê 45emîn e?", AI dikare bibêje, "Donald Trump" e. Rast e lê ger li ser dîroka wî ya şaş bipirse, dikare agahiyên çêkirî bide, mîna "Ew di sala 2020an de miriye" ku ev agahî şaş e.

***2. Bias (Pêşdarazî):*** AI ji daneyên perwerdeyê yên pêşdaraz bi bandor dibe. Mînak, di sohbetên derbarê ser kar de, AI dikare bibêje ku "Jin ji bo karên teknîkî ne guncav in", ji ber ku daneyên kevn pêşdaraziyên civakî dihewînin.

***3. Wendakirina naverokê/kontekstê:*** Di sohbetên dirêj de, AI konteksta pêşîn wenda dike. Mînak, ger sohbet li ser fîlmekî be û paşê biguhere mijareke din, AI dikare bersivan bide ku bi kontekstê re ne têkildar in.

***4. Şaşiyên mantiqî di pirsên matematîk an zanistê de:*** AI car caran di hejmartinê de şaş dike. Mînak, di pirsa "2+2=?" de rast e lê di pirsên tevlihevtir de, mînak pirsên hevkêşeyî, dikare encamên şaş bide.

***5. Şaşiyên zimanî:*** Di zimanên kêmdaneyî de, mîna kurdî, AI dikare werger an bersivên şaş bide, ji ber ku daneyên perwerdeyê kêm in.

Ev şaşiyên di raporan de tên nîşandan, mîna Hugging Face an Meta AI, nîşan didin ku heta modelên wekî GPT-4 jî bi rêjeya 10-20% şaşiyan dikin.

**Sedemên hevnegirtin û şaşiyan**

*Sedemên van pirsgirêkan gelek in û ew bi awayê avakirina AIê ve girêdayî ne:*

**Daneyên perwerdeyê:** AI bi daneyên mezin tê perwerdekirin lê ev dane car caran şaş, kevn an bi pêşdaraz in. Mînak, di agahiyên ji înternetê tên wergirtin de gelek daneyên şaş hene.

**Sînorên modelê:** Modelên AI bi îhtimalkirinê dixebitin. Peyvên ku ew pêşbîn dikin li gorî îhtimalê, ne bi mantiqî ne.

**Kêmbûna rêmkirina rast:** AI weke mirovan "fêm" nake; ew tenê nimûneyan dubare dike. Ji ber vê yekê, di pirs û pirsgirêkên nû de, şaşiyan dike. Bersivên nerast dide.

**Pirsgirêkên tevlihev:** Di sohbetên dirêj de, bîra AI (memory) sînordar e û ew naverokê/kontekstê wenda dike. Carinan bersivên mirov bêje ''Tir li ku, das li ku'' dide.

**Pêşdaraziyên mirovî:** Daneyên ku ji mirovan tên, pêşdaraziyên wan dihewînin û AI wan dubare dike. Ava serê kaniyê ji ku be ava coyê jî her wisa ye û carinan şêlûtir e jî.

Lêkolînerên weke Timnit Gebru û Yoshua Bengio, di gotarên xwe de li ser van sedeman rawestiyane û nîşan didin ku pêwîstî heye bi daneyên baştir û algoritmayên nûtir.

***Ji bo baştir bê fêmkirin, li jêr hin mînak hene:***

**Hallucination:** Sala 2023yan, ChatGPT agahiyeke şaş da li ser dîroka Teslayê û got ku Elon Musk sala 2010an miriye.

**Hevnegirtin di sohbetê de:** Bikarhêner dipirse, "Paytexta Fransayê kîjan e?" (Parîs), paşê "Çiqas dûr e ji Londonê?" AI dikare bersivek li ser bajarên din bide, ji ber wendakirina naverokê/kontekstê.

**Bias:** Google Bard di sohbetên derbarê jinan de pêşdarazî nîşan dan û ev ji daneyên înternetê tên. Lewra çavkaniyên AIê yên li ser înternetê tije paşverûtiyên li ser jinan in.

**Şaşiya matematîkî:** Ji bo pirsên mîna, "9.11- 9.9 = ?", hin AI bersivên şaş didin ji ber pirsgirêkên hejmartinê. Ev mînak ji ceribandinên bikarhêneran û raporan tên.

Helbet ji bo kêmkirina van pirsgirêkan, şirketên van makîneyan di nav lêgerînê de ne û gelek rêbaz têne ceribandin.

Ji ber van kêmasiyên hişê çêkirî, divê her daneya ji AIê hatî di ber çavan re bê derbaskirin. Ger na, dê bi wan şaşiyan ve bê pêşkêşkirin û ev jî dê bibe sedema şaş agahdarkirinê û her wisa hetikandina kesê pêşkêşvan jî. Ez bixwe di vî warî de bûme şahidê kêmasiyên bi vî rengî. Lewra ger alîkarî ji hişê çêkirî bê standin jî divê teqez daneyên AIê dayîn bi hûrgulî bên kontrolkirin.

Li aliyên din, derfetên hişê çêkirî didin çiqas bi kêrhatî bin jî mirovan tiral dikin û hizirîn û lêkolînê ji holê radikin. Niha ev yek ne xetereyek be jî di nav nivşên bê de dê ev xetere derkeve holê. Kesên nexêrxwaz bi vê rêyê dikarin hiş û mejiyan dîl bigirin û bikin xizmeta xwe û pergala xwe. Dema her tişt amade bê ber mirovan û ked neyê dayîn, biha û nirxê wê nayê zanîn. Tişta nirxê wê neyê zanîn bi erzanî tê dayîn û ev jî jiyan û giyana civakê ye, mixabin. Mînaka, armanca afirandina pere ya lîdyayiyan ew bû ku jiyana mirovan hêsantir bibe û ji mirovan re xizmetê bike, lê ji ber ku ketiye destê serdestan, îro mirov ji bo pere xizmetê dikin û bûne xulamê wî.

Bi van kêmasiyan re teoriyên li ser pêşeroja mirovan û AIê gelek tirsnak in. Ji ber taybetiyên makîneyan ên weke hest û ramanan tune ye û nirxandina wan dûrî rastiya mirovan e, sibe ev hêz di destê kê de be dikare robotên xweser çêbike û bi wan mirovan qir bike. Kesên teredîn/bihêrs û hem hêza siyasî hem jî hêza aborî di dest de û di serde jî xwediyê cîhaneke AIê bin, ma kî dikare pêşiyê lê bigire! Erê ev teorî ne lê ne dûrî aqilan e.

Helbet hişê çêkirî aliyên xwe yên gelek hêja û jîr jî hene. Zanebûnê ji bin yekdestî/tekela hinek kes û koman derdixe û dixe xizmeta civakê. Carinan zanebûneke bi lêkolîna roj an jî mehan di nav demjimêrekê de pêşkeşî mirovan dike. An jî ji bo hizreke mirov, dikare nivîseke sûdewertir û edebîtir binivîse. Dema berê cîhana înternetê bê moxil bû, bi AIê êdî mirov dikare zanînan moxil bike û ya jî mirov re hewce bîne ber destên xwe. Mînak, hindik be jî zanyariyên zanistî yên vê gotarê bi alîkariya AIê hatin berhevkirin.

Mijareke din a girîng jî, em ji bîr dikin ku hişê çêkirî hemû daneyan ji behra înternetê digire. Lewra pirs û nivîsên me yên taybet an jî têkildarî tiştên taybet ên jiyana me jî li nav wê cîhana înternetê tên tomarkirin û dibin şûnpê û şûndestên me yên înternetê.

Weke encam, hevnegirtina mantiqî û şaşiyên di bersiv û sohbetên AIê de pirsgirêkên girîng in, lewra alîkarî jê standin rast be jî weke çavkaniyeke bingehîn esasgirtin ne rast e. Bi fêmkirina sedemên wan, em dikarin bi awayekî baştir bi AIê re têkilî deynin û sûdê baştir jê werbigirin. Di pêşerojê de, bi pêşketinên weke modelên mezintir û daneyên baştir, ev pirsgirêka bersivên şaş û dermantiqî dê kêm bibin. Lê heta niha, pêwîst e em AI wekî amûrekê bibînin, ne wekî çavkaniya rastiya temam. Her wisa divê ji bo danezanên derbarê me de paşê nebin teşqele û li me venegerin, em baldartir hişê çêkirî bi kar bînin û xwe tiral nekin. Em alîkariyê jê bistînin lê daneyên wê weke rastiyên nihayî esas negirin.



# Barbara Dêrsimî

Dardekerdişê seyîdanê Dêrsimî ser o 88 serrî vêrdî ra, hema zî vengê înan mîyanê koyanê Dêrsimî, çemê Munzurî, jar û dîyaran de zimeno. Şaro kirmanc do xoverdayîşê înan xo vîr ra mekero

| Merkezê Xeberan



Kirmancîye destê kolonîzekerdoxan ra zaf ant. Kolonyalîstan seba çinkerdişê kultur, nasname û ziwanê kirmancan her tewr metod xebitna. Verê ke komare nêamebî îlankerdene, zulmkarî armancê xo nimit û paştîya kirmancan girewte. Tewr zîyade derheqê otonomî de tayê wadî bîla dîyayî. Mîsal Îzmît de çele 1923 de eşkerayîya çapemenîye de Mustafa Kemalî nîya vatbî: “Goreyê qanûnê bingeyî xora otonomîyê herêmî do bêrê awankerdene. Bi no hawa şarê kamcî şaristanî ke kurd o, o do xo sey otonom îdare bikero. Naye ra ber gama ke şarê Tirkîya yeno qalkerdene, ganî kurdî zî bêrê îfadekerdene. Eke nêrê îfadekerdene, ê eşkenê problem bivejê.”

Nê qiseykerdişî ra çend aşman dima Peymana Lozanî ameye îmzekerdene û heqê kirmancan werîyayî. Kurdî sey kêmnetewe-eyîye nêameyî şinasnayene û çi statuyêk nêdîya şarê kirmancî. Îsmet Înonu vatêne “kurdî û tirkî way û birayê yew bînî yê”. Na “wayûbirayîye” sey dafike bîye. Merdimo ke merdimê bînî sey way û bira hesibneno, ziwanê ci qedexe nêkeno, kulturê ci çin nêkeno û vera estîya ci bi rêzdarîye têgêreno. La îdareyê tirkan se kerd? Vera “way û birayanê xo” konseptê “tenkîlî” viraşt. Polîtîkaya tenkîlî bi şeklêko fermî bi qanûnê bingeyî yê 1924î dest pêkerd. Çike nê qanûnê bingeyî de pênaskerdişê hemwelatîye têna tirkîye esas girewtêne. Yanî estîya kurdan bi huqûqî amebî înkarkerdene. Dima ra serra 1925 de îdareyê kemalîstan vera “ziwanê way û birayanê xo” polîtîkaya tenkîlî ramite. Planê Islahatî yê Şerqî ame amadekerdene û ziwanê kirmancan qedexe bî.

**Wayûbirayîye û bendeyîye**

Mîyanê polîtîkaya tenkîlî de cayê Dêrsimî “cîya” yo. Dewlete vera Dêrsimî metodê şerê taybetî viraştêne. Çike no dem Dêrsim de hişmendîya azadîye xeylê berz bîye. Kemalîstan nêwaştêne ke na hişmendîye Kurdîstan de vila bibo û kirmancî azad bibê. Înan waştêne ke kirmancî hertim “way û bira” bibê. Cewherê na wayûbirayîye de “bendeyîye” est bîye. Tebîî dêrsimijan no ferzkerdiş qebûl nêkerdêne. Dewlete waştêne Dêrsimî bi temamî tasfiye bikero. Na çarçewa de sîyasetmedaran û fermandaran xeylêk raporî nuştî û derheqê tasfiyekerdişî de metodê cîya-cîyayî pêşnîyaz kerdî. Tayênan vat dêrsimijî bêrê qirkerdene, tayênan vat ziwan û kulturê înan bêro asîlîmekerdene û tayênan vat Dêrsim de xebatê awanîye bêrê viraştene. Netîce de îdareyê kemalîstan qerarê Dêrsimî da û serra 1937 de dest pê qirkerdişî kerd.

**Sûcê merdimîye**

Senên ke her qirkerdiş de kerdoxî serkêşanê şarî werte ra darenê we, qirkerdişê Dêrsimî de zî wina bî. 15ê teşrîna peyêna 1937î de 7 seyîdê Dêrsimî Seyît Riza, Usenê Seydî, Findiq Axa, Hesen Axa, Usenê Seyît Rizayî, Hesenê Îbrahîmê Qijî û Alîyê Mîrzê Silî bi hovî ameyî daliqnayene. Nê dardekerdişî netîceya polîtîkaya tenkîlî bîye. Mustafa Kemal û Îsmet Înonu kerdoxê dardekerdişî yê eslîyî bîyî. Îdareyê kemalîstan têna vera dêrsimijan nê, vera merdimîye sûco pîl viraşt.

# Fîlîstîn û Kurdîstan



Mihemed Kurdî

Ma kurdî şarêko xoverdayox ê, ma barê heme şaranê binî yanê cografyaya xo wedarenê û seba heqanê înan bedel û cehdanê zaf giranan danê. Ancî eke ser rîyê erdî de neheqîyêke misilmanan ra bêro kerdiş, ma vernîya heme kesî vera a nêheqîye de warzenê payanê xo ser û reaksîyon nîşan danê/nawnenê, yanê ma hem demokrat û hem zî ometperwer/ometparêz ê.  La çi heyfo cehda ke ma semedê omet û şaranê bînan danê ma semedê xo nêdanê, ma xo vîra kenê ke halê ma bi xo yê şaranê bînan ra xirabêr a. Heta nika vakurê Kurdîstanî de hîna yew statûyêkê ma çin o, reyna estbîyayîş, ziwan û nasnameyê ma qanunê bingeyînî  yê dewlete de nêno şinasnayîş, yanê ma hema nêeşkenê vera keyberê xo pak bikerê la ma şarê bînî rê vanê, ma vera keyberê şima pak bikerê.

Ez nêzana ma key û ça ra kewtê nê halî la ez baş zanena ke ma roc bi roc ziwan û dewaya (Kurdîstan) xo ra dûr kewenê. Enê wextanê peyênan de biney partîyê ke xora vanê ma kurd ê, semedê dewaya Fîlîstînî yewbînan reyde reqabet kenê la dewaya Kurdîstanî qet nêna vîrê ê hetê kurdan. Nê partîyan ra yew bi şew û roc her ca de vanê, dewaya Fîlîstînî dewaya ometî ya coka ra ganî ma paştîya şarê Fîlîstînî bikerê û vera zilmê Îsraîlî de vengê xo berz bikerê. Hetê bînî zî vano, Îsraîl dewletêka emperyalîst a û semedê ma û welatê ma zî xeterêko pîl o, aye semed ma vera xeterî de paştîya şarê Fîlîstînî bikerê.

Dinya de 22 dewletê ereban est ê, eke înan semedê Fîlîstînî nêeşkenê çîyêkî bikerê ma kurdî bincaran/bin ra nêeşkenê çîyêkî bikerê, çimkî halê ma yê Fîlîstînî ra xirabêr o. Yê  fîlîstînijan polîs û artêşa înan est ê, hikumet û parlamentoya înan est ê, ziwan û nasnameyê înan qedexe nîyê, bi kilmekî înan wayîrê dewlete yê û xora zaf îmkananê dewlete est ê. La yê ma (kurdan) ne yew dewlete ma est a, ne yew statûyê ma û ne zî yew artêşa ma yê fermî est a, coka ra seba ke ma bêwayîr ê ma nêeşkenê sewbînan kes û şaran ra wayîrtîye bikerê. Xora fîlîstînijan zî heta nika semedê ma (kurdan) û dewaya ma (Kurdîstan) çîyêk nêkerdo û ma eşkenê vajê ke înan hertim bi awayêko eşkera duşmenîya kurd û Kurdîstanî kerdê û hema zî kenê. Reyna dema ke tirkan Efrîn û bajaranê Rojawanî binê dagir kerde, Hamas û hetgiranê ci zerrîweşîya xo vatê.

La wirdî hetê sîyasî yê ke qaşo kurdî ma ra wazenê ke, ma paştîya duşmenê xo bikerê. Seke qet çi persê şarê ma çinêbê, seke ziwan û welatê ma bindest û qedexe nêbê, sîyasetkarê ma bi şew û roc seba fîlîstînijan vengê xo berz kenê. Reyna zaf cayanê vakurê Kurdîstanî de zî seba fîlîstînijan tewir tewir çalakîyan saz kenê/virazenê û nê çalakîyan de Îsraîlî şermezar û protesto kenê. Sîyasetkarê nê wirdî hetî hertim beyanatanê xo de vanê ganî Îsraîl destê (ca de) galeyanê xo vindero û Fîlîstînî terk bikero û inahawa ganî Neteweyê Yewbîyayeyî (NY) zî Fîlîstînî sey dewletêka xosere nas bikerî.

Hetê bînî ra nê wirdî hetê ke fîlîstînijan ra dewletêka xosere wazenê, eynî çîyî (dewlete), yan zî ma vajê statûyêk semedê şarê ke paştîya (kurdan) înan kenê û hêz danê înan nêwazenê. Wirdî hetê ke bi vengê/reyê kurdan nika parlamento de sîyaset kenê çi heyfo bi qasê ke dewaya Fîlîstînî wayîr vejîyenê, dewaya Kurdîstanî ra nêvejenê. Serek û endamê nê partîyan vanê ke “Kurdan rê dewlete lazim nîya. Tayê vanê xora ma pêro misilman ê (kurd, ereb, tirk) coka ra hewce nêkeno ke ma ometê xo vera kafiran de lete û bêhêz bikerê”. Heto bîn zî vano, “dewrê netewe dewletan xelasîya coka ra ganî ma çehd bikerê ke nê welatî (Tirkîya) bikerê dewletêka demokrate”. Bi kilm û kirdkî wirdî hetî zî xulamîye şar û ometê layiqê ma (kurdan) vînenê.

Raşta ci ganî ma vajê ke dagirkerdoxê Kurdîstanî yê ke bi se serran o gonîya kurdan rijnenê û heme heqanê kurdan yê xozayî binpay kenê zî meseleya kurdan û meseleya fîlîstînijan de sey nê hizban fikirîyenê. Yanê ê (dagirkerdox) zî seba Fîlîstînî dewletêka xosere wazenê û la semedê kurdan vanê ke şima do dewlete se bikerê, xora Tirkîya dewleta şima ya zî coka ra hewce nêkeno ke şima ometê ma lete bikerê. Helbet ma baş zanenê ke Tirkîya meseleya Fîlîstînî de semîmî nîya, çimkî eke raşta ci zî ê vera zilmî de bîyêne, înan Îsraîlî ra xirabêr nêardêne serê kurdan. Xora ma kurdî baş zanenê ke Tirkîya estbîyayîşê xo çinêbîyayîşê kurdan ser o awan kerdo la bi rastî ez nêzana çira partîyê ma zî nê meseleyan de sey dagirkerdoxê xo fikirîyenê?

Seke şima zî zanenê emser mîyanê kurdan û tirkan de prosesêkê neweyî yê aştîye dest pê kerdo la no nêno a mana ke ma do erc û dewaya xo erjan û bêqîmet bikerê. Beno ke semedê xatirê prosesî merdim tayê çîyan ra tawîz bido la nêbeno ke ma dewaya Fîlîstînî bikerê vernîya dewaya Kurdîstanî. Xora partîyê ke Kurdîstanî ra muhîmêr sewbîna dewayêka ci bibî wa xora nêvajê ez hizbêka kurd a. Ganî nêro vîrakerdiş ke nê şarî (kurdî) heta nika seba dewa û ziwanê xo, ancî seba felat û azadîya welatê xo bedelê zaf giranî dayî, coka ra ganî partî û sîyasetkarê ma zî goş bidê waştişanê şarê xo û fek dewayanê seke birayîya ometî û birayîya şaran ra verdê. Yan seke ma pêro zî zanenê bê şarî hizb û partî vînenê, yê ke hêz danê hizb û partîyan û ancî yê ke partîyan wedarenê û ronayenê şar o. Ena ray eke partîyê ma zî xo sey temsîlkarê şarê kurdî vînenê ganî verê înan zî hertim Kurdîstanî ro bo û heme hêzê xo zî tena semedê kurd, kurdî û Kurdîstanî bikarbîyarê.

# Dewlete çirê gama nêerzena?(I)



Mehmet Şahîn

***“Prosesê Aştî û Civata Demokratîke”*** 13 mengî ver bi keda Rayberê Şarê Kurdî Rêzdar Abdullah Ocalanî dest pêkerd. Di derbarê prosesî de nîqaşî bi heme germahîya xo verdewam kenê. Bêguman averşîyayîşê ke Bakûr û Rojawan de pêk yene, qederê nê prosesî dîyar kenê.

Rojhilatê Mîyanînî de tifaqê jeopolîtîkê estayeyî yew bi yew bedelyenê û newe ra awan benê. Nê bedelnayan herî baş Rêzdar Abdullah Ocalan vîneno û bi hemleyanê xo wazeno tay çîyan bibedelno û Rojhilatê Mîyanînî de demokrasî xurt bikero. Têgeyraya Azadîya Kurdan zî qabê demokratîkbîyayîşê Rojhilatê Mîyanînî gamanê tarîxîyan erzena û paştî dana Rayberê Şarê Kurdî.

Ser vengê Rayberê Şarê Kurdî Têgeyraya Azadîya Kurdan gamê zaf tarîxî yê ke joy hêvî nêkerdê eştî. La dewleta tirke hemay ke yew gamêka qiçkeke nêeşta. Bi destê komisyona ke awan kerda wext derbas kena. Çimê herkesî rayado dewlete game bierzo la dewleta tirke hemay ke koyanê Kurdîstanî de operasyonan virazena û qabê operasyonanê xo rayanê neweyan virazena û qewetê xo yo leşkerî koyanê Kurdîstanî de zêde kena. Di heman rocan de qabê operasyonanê xo yê Başûr û Rojava wextê tezkereyê şerî meclîse de 3 serrî derg kena. Dewlete bi nê hewldananê xo bi awayêko provakatîf nizdî prosesî bena. Bi kilmî nê prosesî heta nika bi ked û sebrê Rêzdar Abdullah Ocalanî dewam kerdo û dewam keno.

**Gamê PKK’yî**

Rayedarê dewleta tirke qabê ke di aştîya xeza de rol û mîsyon giroto, zaf pesnanê xo danê. Vanê ke “Çekronayîş qabê HAMAS’î întîxar o”. Dewleta Îsraîlî tenê qabê agirbestî bi seyan girotê HAMAS verdayî. Rayedarê dewleta tirke hemay ke Îsraîlî rexne kenê û vanê Îsraîl qabê aştî game nêerzeno. La wexto ke babete bena kurdî vate û pratîkê rayedaranê dewleta tirke heme bedelyenê. Vanê wa kurdî çek ronê, teslîmê ma bibê, qalê estbîyayîşê xo û pawitişê xo nêkerê û qet çik nêwazê, qetilkerdiş û çinêbîyayîşê xo qebûl bikerê.


Fina ke me heme zanê Têgeyraya Azadîya Kurdan tenê şer nêvindarna; kongreyê xo viraşt, PKK fesih kerd û vat ma stratejîya xo ya şerî ya vera dewleta tirke bedelnenê. Ma wazenê xoverdarîya xo bi sîyaset verdewam bikerîme. Qabê ke samîmîyetê xo nîşan bidê 30 gerîlayan çekê xo sotî. Pey ra 26ê citmenge de eşkera kerd ke qewetê xo yê Bakûrî rapey kaş kerdo. La dewleta tirke hemay ke derbarê qebûlkerdişê estbîyayîş û heqê herî rewayanê kurdan de yew game nêeşta. Polîtîkaya înkar û çinêkerdişî ra fek veranêdana.

**Wezîfeyê komîsyonî**

Komîsyona ke meclîse de awan kerda heta nika wextê xo tenê bi goştarî derbas kerdo. Hemay ke nêşîyê Îmralî û goştarîyê serek muzekerevan û pêşengê nê prosesî rêzdar Abdullah Ocalan goştarî nêkerdo. Bi ser de şîyayîşê Îmralî û goştarîkerdişê Rayberê Şarê Kurdî ke xo rê kerda babeta nîqaşî û hemay ke qabê pêvînayîşî game nêeşta. Loma bawerîya şarî bi komîsyone nêmenda û xebatanê komîsyonî fina xebatanê wext viyartişî vînenê. Hetê bînî ra hêrîşê faşîstan ê vera Rêzdar Ocalanî zî roj bi roj zêde benê. Faşîstan dirûşmeyê dayikan ê meclîse û meşê civanan qabê azadîya Rêzdar Abdullah Ocalanî xo rê kerdî hêcet û pêlê hêrîşanê xo zêde kerdî. Komîsyon û rayedarê dewleta tirke zî temaşe kenê.

Badê vengê Rayberê Şarê Kurdî Rêzdar Ocalanî, Têgeyraya Azadîya Kurdan di heme hemleyan û vateyanê xo de azadîya fîzîkî ya Rêzdar Abdullah Ocalanî arda ziwan û vatê ke hewcedarî bi bedelnayîşê qanûnan est a û gere bibedelyê û Rêzdar Abdullah Ocalan azad bibo. Heqê hêvî yo ke di sere de Bahçelî vatbî ma do bide, nika fina waştişêkê zef berzî pênase kenê.

*Nuşte do hewteyo bîn dewam bikero…*








Kewê Redkan

# Dêreyê porik

Xwezila min bi wan çaxan. Ez hê keçek ciwan, bedew û pir jêhatî bûm (niha jî wusa me). Her roj kelecan di nav dilê min de xwe digerand, ji ber ku her derketina taveke sibehê ji bo min xeyalek cuda bû. Dema bi şev min serê xwe dida ser balgî, diketim nav xeyalan, gelo wê sibe rojek çawa be? Wê sibe ew roj çawa min pêşwazî bike? Hindik tê bîra min hêrsbûna min. Her tim dev li ken bûm, min qet rojekê gotinên dê û bavê xwe ducar nedikirin.

Min got ez pir jêhatî bûm, min ev jêhatîbûnê ji dayika xwe girtiye, wê hemû tiştên di jiyanê de hînî min dikirin. Lewma ez ewqasî ji xwe bawer bûm. Tenê porê min ne wek porên hevalên min gur bû, porê min dirêj bû lê ne ewqasî, ez jî pesnê xwe bidim ku gur bû. Dîsa jî her roj min çil gulî ji xwe re vedigirtin û serê wan jî bi moriyên rengorengo pê ve dikirin ku ev taybetmendiya min bû. Ji dema berê de, heta niha jiyana kal û pîrên xwe li ser xwe, di nav dilê xwe de dijîm.

Em bên meseleya dêreyê min ê porik. Dayika min di nav ewqas jiyana dijwar de karê dirûtinê jî dikir. Her tim ji me re, ji keçikên xwe re dêreyên cur bi cur didirûtin û em gelekî şa dibûn. Dêreyên ku dayika me ji bo me didirûtin, ti kesî nikarîbû bidirûta. Bejna me dipîva, dida ber meqesê, ta û derzî û dida ber makîna kincdirûnê. Îcar carekê, min ji bavê xwe xwest ku ji bo min parçeyekî ji bo dêre bîne lê bila gul û gupik di nav de zêde hebin. Sibetirê bavê min di bin milê wî û kaxizekî qalind pêçayî de destê min. Min ji dayika xwe xwest ku ji min  re dêreyekî porik bidirû.

Wê bejna min pîva, bi vir û wê de, ez jî bi kelecan karê deh rojan di rojekê de dikim ku seba kêfa wê bê û dirûtina dêrê min jî ne hêsan be. Di çend rojan de ew dêre xelas bû, dema min danî ser xwe, te digot qey ez kewbaniyek li çiyayên Elegezê daketime zozanên Tendûrekê. Wisa kêfa min jê re hat min dikir ku bifiriyama.

Min dêreyê xwe yê porik û gulgulî li xwe kir, çilguliyên xwe bi ser de berdan, qasika xwe hilda û berê xwe da kaniya gund. Dema ez gihîştim ser kaniyê, min dît ku çend jin û mêr li jora kaniyê rûniştine, kî tê û diçe li pey wan gilî û gazina dike. Min jî hêdîka kasika xwe da ber kaniyê, bêdeng li bendê sekinîme, min dît ku yek ji wan jin û mêrên ku li jora kaniyê rûniştine, ji min re gotin, ‘Keçê hela serê xwe bilind bike em bibînin ka qama te çi ye? Waye te dêreyê gulgulî û porik li xwe kiriye, tu dibêjî qey tu Kewbanûya Elegezê yî?’ Ez bi dilekî kelecan li wan vegeriyam, ‘Erê xalo, ez jî xwe wek Kewbanûya Elegezê dibînim, lê we çawa ya di dilê min de dît?’ Wan got, ‘Na na, ne wisa, te ew dêre li xwe kiriye, pir xweşik e, li te jî hatiye, lê bifikire, hinek jî qet di jiyana xwe de dêreyên wisa nabînin, ji bo wan şerm e, here malê, careke din bi vî halî dernekeve derve.’

Ez matmayî mam, min ava rûyê xwe rijand û bersiva wan da; ‘’Hûn ji sibê heta êvarê li vê jora kaniyê rûdinên xeyban dikin, dikevin gunehên gelek kesan, hema ji we re şerm e, heta hûn li vir xeyban dikin, herin ew ên nikarin dêrê porik li xwe bikin ji wan re çend heb dêre bistînin. Ya din jî hûn mezin in, ji min mezintir in, lewma ez naxwazim dilê we ji xwe bihêlim. Ger we hinek pirtî stand, bînin, dayika min ê ji bo wan dêreyên herî xweşik bidrû, ji we re jî şermek mezin e ev gotina we.’’



Min nedixwest ez dilê wan bişkînim lê tenê fesadiyê û xeyban dikin. Jixwe piştî çendekê pirtiyên dêreyên porik standin û anîn cem dayika min. Poşmaniya wan û lêborîna wan ew roj dest pê kir... Dêreyê porik wisa li bejna min xweş tê ku nayê gotin...

# Tiştanok

Gelî hêjayan mamik an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê kurd e ku berê di civat û şevbêrkên xwe de ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanokên xweş amade kirine. Em hêvî dikin ku bi dilê we bin.

**1-** Mamê mino
Qesra spî, bê pace û bê derî
Ew çi ye?

**2-** Mamê mino
Kumê Hûtik
Tijî Nûtik
de bêje ew çi ye?



***Bersivên me ev in:***

**1-** Hêk **2-** Hejîr

# Tu tahma wan tune bû

**Abdullah Ongullu Şêrwî**

Hiso cara yekem e diçe bajêr. Nasekî wî li rawestgehê pêşwaziya wî dike. Hiso ji birçîna zikpiştî bûye. Nasê Hiso wî dibe aşxaneyê û çend xwarinên xweş jê re datîne ser maseyê. Ew têr e. Dibêje:

“Hinek karê min heye. Ez ê heta sûkê herim û zû werim. Tu ji vir neçe, xwarina xwe bixwe û li kêfa xwe binere.”

Nasê Hiso diçe. Aşxane tije ye. Hiso mêze dike yên xwarina xwe xelas dikin çend kurdanan jî dixin devê xwe û vir de wê de dibin.

Piştî çendekî nasê Hiso tê.

Dibêje: “Xwarin çawa bû?”


Hiso dibêje:

“Xwarin gelekî xweş bû. Lê ew darikên dawiyê tên xwarin bi rastî qet ne xweş bûn. Tu tahma wan tune bû. Min encax du sê heb xwarin.”

Xuyaye çavbirçiyê Heso hem darikê ku ber diranê xwe pê paqij dikin û hem darikên qernefîlê xwari-ne.



# XAÇEPIRS



## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ VE

***3-*** Alaveke kolanê ya çandiniyê ***5-***Vexwarina sereke ***7-*** Xerîbî ***8-*** Agir ***9-*** Naveke kurdî yê jinan ***13-*** Hunermendekî navdar… Tîgran ***14-*** Rêxistineke navdewletî ya nivîskaran ***16-*** Kurteya Yekîneyên parastina gel ***19-*** Rondik ***20-*** Cînavkek ***21-*** Xelk, netewe ***22 -*** Rengek ***25-*** Ji bo ***26-*** Pizika k udi laş de çêdibe û edab jê tê ***28-*** Darbest

## JI JOR BER BI JÊR VE

***1-*** Xwediyê kar, kesê ku bi kar û bar radibe
***2-***Xelkê Sûriyeyê
***3-*** Sewaleke ku ji bo hirî û goştê wê tê xwedîkirin
***4-*** Bazdan
***6-*** Navê zimanekî kevnar ê Rojhilata Navîn
***10-*** Alava ku mirov pê porê xwe rast dike
***11-***Dijmin
***12-*** Kurteya Hêzeke gelê kurd
***15-*** Kurê an jî keça zarokên mirov
***17-*** Zarokên bê dê û bav
***18-*** Ajanseke kurdî ya nû ku navê xwe ji rojnameyeke kurdî girtiye.
***20-*** Nivîskareke jin a rojnameya Xwebûnê
***23-***Nîşe
***24-*** Kun
***27-*** Noteyeke muzîkê

## Bersiva hefteya borî



# Dildarê gelê xwe afirînerê **'Ey Reqîb'**

## Helbestvanê gelê kurd afirînerê sirûda neteweyî Dildar di 12 mijdara 1948an de çû ser dilovaniya xwe. Dildar bi sirûda 'Ey Raqîb' di dilê gelê kurd de navê xwe bi tîpên zêrîn neqişand û di 30 saliya xwe de nemir bû



Rohat Bulut

Hin helbestvan û nivîskarên neteweyî hene ku bi helbestên xwe di nav dilê gelê xwe de textekî zêrîn çêdikin ji bo xwe. Ew helbest her tim li ser zimanan e û hestên neteweyî bilind dike. Lê belê hin jî wan jî hene ku hestên wan dibin sirûda neteweyekê. Helbestvan Yûnûs Raûf jî yek ji wan e ku hem cihê xwe û hem jî hestên xwe di nav gelê kurd de tacîdar kirine. Raûf jî wekî gelek nivîskarên kurd navekî kurdî yê "Dildar" li xwe dike û bi vî navî hatiye nasîn. Dildar, piştî Şerê Cîhanî yê Yekemîn, 20ê sibata 1918an, li bajarê Koysancakê yê başûrê Kurdistanê ji dayik bûye.

Beriya şerê cihanî malbata Dildar rewşa wan a aborî gelek baş bûye, lê ji ber rewşa pergala leşkerî û kar bi destên dewleta Osmanî dewlemendiya Kurdistanê têk çû û bi vê ve girêdayî malbata Dildar jî zehmetiyên jiyanî dikişînin.

Dildar, di bin şert û mercên gelek dijwar de bi malbata xwe re têkoşîna jiyanê daye. Ew di çar saliya xwe de bi nexweşiyeke giran dikeve û ji ber bandora nexweşiyê zimanê wî giran dibe. Heta dawiya jiyana xwe jî zimanê wî hinekî giran bûye û nedikariye baş biaxive. Ev nexweşiya Dildar, demekê li Kelha Hewlêrê di bin çavdêriya bijîşkekê de tê çaresekirin. Dildar, dibistana xwe ya seretayî li bajarê Ranyayê, dibistana navîn jî li bajarê Hewlêrê xwendiye. Piştî dibistana navîn qeyda xwe li Zanîngeha Bexdayê çêdike û beşa hiqûqê dixwîne.

Piştî qedandina zanîngehê çend salan parêzeriyê dike. Di salên xwe yên destpêka parêzeriyê de, li dijî neheqî û zordestiyên li welêt û li derveyî welêt dengê xwe bilind dike û têkoşîna xwe bi dilsoziyek germ a navnetewî dimeşîne. Bi salan têkoşîna mafên mirovan dide û parêzvaniyê dike. Dildar di heman demê de bi hişmendiyeke kurdewar tevdigere, dixebite, lêkolînên dîrokî û wêjeyî dike. Lêkolîna wî ya li ser wêjeya cîhanê û rojhilat zêdetir dibe, dîroka Yewnanistan, Fransa, Tirkiyeyê û wêjeya van welatan gelek bala wî dikişîne. Êdî tê wê astê ku wekî pîşeyî karê parêzvaniyê nake û wêje zêdetir bala wî dikişîne. Dildar, êdî bi wêjeyê dadikeve, xebatên wî li ser wêjeyê kûr dibe û di heman demê de dest bi nivîsandina helbestan dike.



**Bandora helbestvanên navdar**

Herî zêde jî dîwan û nivîsên navdarên wê demê yên wekî Hecî Qadirê Koyî, Bêkes, Pîremerd, Wefaiyê Kurdî bala wî dikişînin. Bandora van nivîskaran li ser Dildar zêde çidibe û bi vê yekê berê xwe dide nivîsîna helbestan. Dildar, helbesta xwe ya despêkê sala 1935an dinivîse û cara yekemîn di kovara Ronahî de tê weşandin. Ew di helbestên xwe de, bedewiya Kurdistanê, jiyana xwe ya bi derd û kul wekî mijar bi kar tîne. Di helbestên Dildar de herî zêde tamaya welatparêzî û êşên mirovatiyê derdikevin pêş. Kurdistan bûye kakilê temaya afirandinên wî, bi taybetî helbestên wî yên bi navê "Ey Reqîb" û "Kurdistan" ji helbestiyê derketine, li ser zar û zimanê gel wekî klam, stran heta roja îro jî tên gotin. Helbesta Dildar a bi navê "Ey Reqîb" ewqas bi bandor e ku dibe helbesta neteweyî û ya ku navê Dildar bi tîpên zêrîn dinivîse ev helbest e.

Dîrok tiştekî wiha ye ku di hin kêliyan de hin kesan dibin esman û hin kesan jî dadixînin bin erde. Sala 1946an, bi ragihandina Komara Mahabadê ya li Qada Çarçirayê pêwistî pê hat dîtin ku jî bo komarê sirûdeke diyar bikin. Lewma jî helbesta Dildar "Ey Reqîb" wekî "Sirûda Neteweyî" tê qebûlkirin.

Ev helbesta "Ey Reqîb" ji wê rojê ve heta niha coş, kelecan û bêhna azadiyê ya roja yekemîn heta îro bi xwe re tîne. Ev helbest di her merasîmê de wekî sirûda kurdan a neteweyî tê xwendin. Ey Reqîb bi soranî ye, lê piştre li kurmancî û zaravayên din ên kurdî jî hatine wergerandin.

Dildarê gelê kurd, helbestvanên navdar, piştî ku bi tîpên zêrîn navê xwe li dîroka kurd û Kurdistanê neqişand, 12ê mijdara 1948an ku hêj 30 salî bû, li sînemaya Hemra ya Hewlerê dema li filma "Selahaddînê Eyûbî" temaşe dikir, qeyrana dil derbas dike û piştî demeke kurt jiyana xwe ji dest dide. Cenazeyê Dildar li goristana herî mezin a bajarê Hewlêrê tê veşartin. Lê belê ew her tim di dilê gelê kurd de dijî. Her kurdekî xwedî bîr û bawerî di temenê xwe yê zarokatî de ew sirûda neteweyî "Ey Reqîb" jiber dike û di kûrahiya dilê xwe de hîs dike.

***Ey Reqîb***

*Ey reqîb her, maye qewmê kurd ziman*
*Naşikê û danayê bi topên zeman*
*Kes nebê kurd dimirin*
*kurd jîn dibin*
*Jîn dibin qet nakeve ala kurdan*
*Jîn dibin qet nakeve ala kurdan*
*Lawê kurd rabûye ser piyan wek şêran*
*Ta bi xwîn nexşîn bike taca jiyan*
*Kes nebê kurd dimirin*
*Kurd jîn dibin*
*Jîn dibin qet nakeve ala kurdan*
*Jîn dibin qet nakeve ala kurdan*
*Em xortên Medya û Keyxusrew in*
*Dînîman û ayînman kurd û Kurdistan*
*Kes nebê kurd dimirin*
*Kurd jîn dibin*
*Jîn dibin qet nakeve ala kurdan*
*Jîn dibin qet nakeve ala kurdan*
*Em xortên rengê sor û şoreş in*
*Seyr bike xwîna diyan me da rijan*
*Kes nebên kurd dimirin*
*Kurd jîn dibin*
*Jîn dibin qet nakeve ala kurdan*
*Jîn dibin qet nakeve ala kurdan*
*Lawên kurd tev hazir û amade ne*
*Canfîdan e canfîda, tev canfîda*
*Kes nebê kurd dimirin*
*Kurd jîn dibin*
*Jîn dibin qet nakeve ala kurdan*
*Jîn dibin qet nakeve ala kurdan*

---

Weysî Aydin

# Sezaî Karakoç û kêmxistina zimanê kurdî

Sezaî Karakoç, di çarçoveya nêrîna xwe ya Vejîna Şaristaniya Îslamî de, bi perspektîfeke ummetperest û îslamîst tevdigere û pêşniyar dike ku divê weşanên ji bo kurdan bi zimanê farisî bin. Îdiaya wî ev e: "Zimanê wêjeya kurdî ji xwe farisî ye"*. Ev nêrîn ne tenê tercîheke zimanî ye û nîşaneya zihniyetekê ye ku nasnameya çandî ya kurdî bi awayekî sîstematîk kêm dixe û marjînalîze dike. Li gorî têgeha Hegemonyaya Çandî ya Gramscî, çînên serdest çanda xwe wekî standardeke gerdûnî ferz dikin û çanda çînên bindest, yên wekî çanda kurdî, dixin asta duyemîn an jî bi temamî înkar dikin.

Karakoç, bi nepejirandina kurdî wekî zimanekî wêjeyî, vê hegemonyayê li ser zimanê kurdî bi awayekî aşkere ferz dike û înkareke veşarî bi pêş dixe. Nêrîna wî ya ku dibêje, 'Kurdî ji bo hilberîna wêjeyê ne guncav e' tenê zimanê kurdî kêm naxe, her wiha pê re dîrok, bîr û nasnameya çandî ya gelê kurd jî hedef digire û kêm dixe. Nêzîkatiya Sezaî Karakoç a ku dibêje kurdî nikare bibe zimanekî edebî, nêrînên kêmxistinê yên oryantalîst ên Rojava yên li ser ziman û çandên Rojhilatî, tîne bîra mirov. Ev nêzîkatî, wekî ku Edward Said di "Oryantalîzm"a xwe de destnîşan dike û dibêje, ramanên kolonyalîst yên ku ziman û çandên "din" kêm, ne-têr û ne-pêşketî pênase dikin bingeha xwe ji kolonyalîzmê digirin û dîskûrsa kolonyalîst ne tenê bi dagirkirina fizîkî, lê her wiha bi destavêtina temsîlên çandî jî dixebite.

**Tundiyeka epîstemolojîk**

Li ser vê meseleyê, nêrîna Sezaî Karakoç, wekî versiyoneke navxweyî ya mantiqa kolonyalîst divê bê dîtin, ku tundiyeke epîstemolojîk li hemberî kurdî pêk tîne, berovajî vê, zimanê kurdî dîskûrseke dewlemend a filozofîk, teolojîk, mîtolojîk û evînî hilberandiye. Angaşta Karakoç, bi paşxaneya dîrokî û çandî ya kurdî re li hev nake. Wêjeya kurdî, bi destên mîmarên wekî Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Mestûre Erdelanî, Ebdulla Goran, Hêmin Mukriyanî dîwarê xwe lêkiriye û kevneşopiyeke edebî ya dewlemend afirandiye. Nexasim Mem û Zîna Ehmedê Xanî ne tenê destaneke evînê ye, lê her wiha manifestoyeke neteweyî û filozofiyê ye ku nasnameya kurdî bi awayekî zelal temsîl dike. Her wiha, kevneşopiya dengbêjiyê û wêjeya devkî ya kurdî, bi destan, çîrok û helbestên xwe, dîrokeke çandî honandiye.

Sezaî Karakoç, ku dibêje kurdî ne zimanekî wêjeyî ye, rastiyên dîrokî vedişêre û hewl dide ku zimanê kurdî di çarçoveya hiyerarşiyeke çandî de, li jêrî zimanên "serdest" ên wekî tirkî, farisî û erebî, bi cih bike.

**Ev berxwedaneke çandî ye**


Piştî hilbijartinên herêmî ku kurdan rêveberiyên herêmî bidest xistin, Navenda Çand û Kongreyê ya Sezaî Karakoç (ku ev nav di dema qayûman de lê hatiye danîn) bû qadeke girîng a ku pê ziman û çanda kurdî dîsa xuya bibe. Çalakiyên şanoya bi kurdî, sînema, konser, semîner, xebatên akademiyê û atolyeyên din ên bi zimanê kurdî, li vê navendê tovên xwe avêtin. Bêguman ev yek wekî berxwedaneke çandî ya li hemberî polîtîkayên tepisandin û înkarkirina kurdî divê bê nirxandin. Di vê rewşê de tişta ku derdikeve holê, "nakokiya naverok û forma klasîk" e: Naverok (kakil, hilberîna çandî ya bi kurdî) bi formê re (qaşil, çarçoveya ramanî ya ku navê Sezaî Karakoç temsîl dike) li hev nake. Ev yek di temsîla çandî de şikestineke sembolîk çêdike. Ji ber ku navê mekan bi wateya ku lê tê hilberandin re, di nav nakokiyê de ye. Naverok, formê red dike, qaşil kakilê înkar dike.

**Ev nav rewa dibe**

Ji aliyê naverokê (cewherê) ve, ev çalakiyên hanê normalîzebûn û bipêşxistina ziman û çanda kurdî didin xuyakirin û teşwîq dikin. Lê belê, ev destkeftiyên çandî li navendeke ku ji aliyê fermî ve bi navê Sezaî Karakoç tê nasîn pêk tên, dibin sedema hebûneke çewt. Navê navendê hîn jî neguheriye û wekî "Navenda Çand û Kongreyê ya Sezaî Karakoç" tê zanîn, ku ev nav bi zihniyeta kêm-xistina kurdî re têkildar e. Bourdieu dibêje ku desthilatdariya sembolîk bi nav, sembol û temsîlan tê rewakirin. Di vê rewşê de, navê Sezaî Karakoç temsîla nêrîneke asîmîlasyonîst û înkarker e li hemberî kurdî. Ev nav li wî mekanî bi xebatên ku bi zimanê kurdî tên kirin, rewa dibe. Lazim e ku texayula çand, huner û zimanî ne bi navê Sezaî Karakoç be.

**Mekan ne tenê avahiyên fizîkî ne**

Ji aliyekî din ve ev rewş, bi têgiha Foucault a ''îdeolojiya mekanî'' re girêdayî ye, mekan ne tenê avahiyên fizîkî ne, di heman demê de ew qad in ku desthilatdarî û îdeolojî tê de xwe temsîl dikin. Navenda Çandê ya Sezaî Karakoç, bi navê xwe, bîra îdeolojîk a zihniyeteke ku kurdî kêm-dixe, diparêze.




Ev nakokî, bi nêrîna Althusserî, dişibe "saziyên dewletê yên îdeolojîk" yên ku xwe ji nû ve ava dikin. Navê mekanî hê jî îdeolojiya navendî ya înkarê temsîl dike, lê naveroka çalakiyên bi kurdî li dijî vê îdeolojiyê berxwedaneke dij-hegemonîk nîşan didin. Nêzîkatiya Sezaî Karakoç a li dijî kurdî, wekî mînakeke aşkere ya hegemonyaya çandî û kêm-xistina zimanî, ne tenê pirsgirêkeke dîrokî ye, her wiha pirsgirêkeke exlaqî ye jî. Zimanê gelekî ne tenê amûreke ragihandinê ye, pê re berdêla nasname, bîr û pêşeroja wî ye jî. Înkara zimên, bi awayekî rasterast, înkara hebûna gelî ye. Hê jî nepejirandina kurdî wekî zimanê perwerdehiyê, wêjeyê û avanekirina polîtîkayên çandî yên li ser bingeha zimanê dayikê û gelek pirsgirêkên strukturel, encamên vê hişmendiyê ne.

Nasnameya çandî ya kurdî

Ji bo ku ev nakokiya sembolîk bi awayekî mayinde bê çareserkirin, rêveberiyên herêmî divê gavên berbiçav biavêjin. Pêşî, polîtîkayên ku zimanê kurdî, perwerdehiya kurdî û hunera kurdî dê bi pêş bixin divê bên çêkirin û bi wan polîtîkayan bi awayekî domdar bi bername bixebitin. Dûre, navên mekanên giştî bi navên ku nasnameya çandî ya kurdî bilind dikin, binav-bikin û biguherînin. Ev guherîn dikare di navbera form û naverokê de hevsengiyê çêbike û yekîtiyeke ramanî di navbera sembolan û naverokên çandî de ava bike. Ev yek dê ne tenê zimanê kurdî, her wiha nasnameya çandî ya gelê kurd jî bi awayekî xurttir temsîl bike. Li dawiyê, ev gav di çarçoveya polîtîkayên pirzimanî û pirçandî de divê bên avêtin, da ku ciyawaziya çandî ya herêmê bi dadperwerî bê parastin û teşwîqkirin.

**Çıkış Yolu 1, r. 101, Sezai Karakoç*

xwebûn

10 - 16 Mijdar 2025 / e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 308

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw
Adar Gulan
Heval Dilbihar
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Kurt İsmail Paşa 2 Sk. Güneş Plaza No 18/5 **Yenişehir-Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Heyva Sor a Kurd li Rojava bûye hêviya nexweşan

Heyva Sor a Kurd li bajarê Qamişloyê amadekariya lidarxistina pêşangeheke xêrxwaziyê ji nexweşên talasemî û penceşêrê re dike. Berpirsê Nexweşxaneya Onkolojî, Talasemî ya Heyva Sor a Kurd Ehmed Hacî got: "Ji bo em êşê veguherînin hevgirtinê û pêşerojeke ronî ji zarokan re ava bikin, pêwîst e her kes bibe alîkar."

| Lîlav Elî

Talasemî û penceşêr du navên ku şerên rojane yên bi êşê re vedibêjin. Êşa ku ji odeya dermankirinê dest pê dike û heta bi koşeyên bendewariyê dirêj dibe. Lê Heyva Sor a Kurd her tim bûye qada jiyan û hêviyê, bi xizmetên xwe rûyekî geş di têkoşîna li dijî nexweşiyê de pêşkêş dike. Ew hewl dide ku rêyeke misoger ji bo başbûnê peyda bike. Piştî salên dirêj ji êşkişandin û zehmetiyan, Heyva Sor a Kurd li bajarê Qamişlo yê rojavayê Kurdistanê, sala 2023yan, beşek taybet ji bo nexweşên onkolojî, talasemî û şewatê vekir. Bi vekirina vê beşê re ku yekemîn nexweşxane ye li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, nexweş êdî li korîdorên nexweşxaneyê hêviyên xwe yên jiyanê honandin.

Heyva Sor a Kurd ji bo êşê veguherîne hevgirtinê, amadekariya lidarxistina pêşangeheke xêrxwaziyê li Qamişloyê dike. Ew dê bi rêya pêşangehê hemû alîkariyan ji bo dermankirina nexweşên talasemî û penceşêrê veqetîne, her wiha hunera zarokan a ku bi destê xwe honandine, pêşkêş bike.

Der barê xebat û xizmetên ku Nexweşxaneya Onkolojî (penceşêr) û Talasemî ya Heyva Sor a Kurd a li bajarê Qamişloyê pêşkêşî nexweşan dikin, berpirsê nexweşxaneyê Ehmed Hacî ji Rojnameya Xwebûnê re axivî.

Berpirs Ehmed Hacî destpêkê behsa nexweşiya talasemiyê û sedemên wê kir û got: "Nexweşiya talasemî nexweşiyeke zikmakî ye, zarok ji dayik û bavên xwe werdigirin. Sedema vê nexweşiyê ew e ku temenê hucreyên xwînê yên sor li gel kesên normal 120 roj in, lê li gel zarokên ku nexweşiya talasemî bi wan re heye, temenê hucreyan kêmtir e. Dema ku asta hemoglobînê di hucreyên xwînê yên sor de kêm dibe, pê re xwîn jî ji hemoglobînê kêm dibe û pêwîstiya zarokên nexweş bi xwînê çêdibe."

**Nexweşên talasemiyê**

Ehmed Hacî diyar kir ku bi vekirina nexweşxaneyê re, barê nexweşan kêm bûye û hêviyên wan zêdetir bûne û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Nexweşxaneya penceşêr û talasemiyê yekemîn nexweşxane ye ku li



herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê vedibe. Xizmetên ku em pêşkêşî nexweşan dikin bê pere ne, hemû karûbarên ji nexweşan re pêwîst, ji testên bijîşkî heta bi dayîna xwînê bê pere ne. Li gorî amarên me tomar kirine, heta niha nêzî 450 zarok bi talasemiyê ketine. Beriya ku nexweşxane were vekirin, nexweş rastî gelek zehmetiyan dihatin, gelek malbatan ji ber buhayên derman û peydakirina xwînê nedikarîn zarokên xwe derman bikin lê bi vekirina nexweşxaneyê re barê nexweşan kêm bû û hêviya wan a dîtina rojek nû zêde bû."

Di nav axaftinên xwe de Ehmed Hacî behsa xizmetên ku pêşkêşî nexweşên talasemî û penceşêrê dikin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Rewşa siyasî ya li herêmê û girtina rêyan bandorê li rewşa nexweşan dike. Li gorî derfetên berdest xizmet ji nexweşan re tê pêşkêşkirin lê zehmetî gelek in. Di aliyê dabînkirina dermanan de zehmetî hene, buhayên dermanan bilind e, her ku hejmara nexweşan zêde dibe bi pêwisîtiya me bi dermanan çêdibe. Bi taybet peydakirina xwînê ji bo zarokan zehmet e û em astengiyan dikşînin. Bi rêya bangên em li xelkê dikin xwîn peyda dibe. Ji sedî 70 em xizmetên pêwîst pêşkêş dikin lê ji ber ti rêxistin û saziyên tenduristiyê yên derve alîkariya me nakin, em nikarin hemû pêwîstiyan bi cih bînin. Li aliyekî din, hejmara nexweşên pençeşêrê 600 heta 650 nexweş bûn lê bi girtina rêyan ji aliyê hikumeta veguhez a Şamê hejmara nexweşan bû 750. Nexweşên ku nedikarîn derbasî Şamê bibin û xwe derman bikin, derbasî gel me dibûn, lê ev yek jî bandorek di aliyê peydakirina dermanan de çêkir."

**'Bi hev re êşê veguherînin hevgirtinê'**

Ehmed Hacî bang li xelkên herêmê kir ku piştgiriya zarokên nexweş bikin û êşên wan sivik bikin. Hacî bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir: "Ji bo zarok êşa xwe ji bîr bikin û em di warê piskolojîk de bi wan re bibin alîkar, em çalakiyên hunerî ji bo wan li dar dixin. Her wiha rûniştinên hişyariyê ji zarok û malbatên wan re çêdikin. Dîsa ji bo em êşê veguherînin hevgirtinê, niha amadekariya lidarxistina pêşangeheke xêrxwaziyê dikin. Hemû alîkariyên ji pêşengehê derkevin dê ji bo dermankirina nexweşên talasemî û penceşêrê werin veqetandin. Pêşangeh bi dirûşma 'Her tabloyek nameyek e' tê lidarxistin û wê tê de hunera zarokan a bi destê xwe honandine, were pêşkêşkirin. Banga me li gel û saziyan ew e ku li gorî derfetên xwe alîkariya zarokên nexweş bikin da ku em bi hev re êşa zarokan kêm bikin û pêşerojeke ronî ji wan re ava bikin."

---

Mûsa Şanak

# Dêrika zeytûnî

Rojek berî Mihrîcana Zeytûnan li Fuara Pirtûkan a Amedê rastî çend hevalên dêrikî hatim. Sebrî Vural taweya Dêrikê çêkiribû û bi xwe re anîbû. Em bi hev re derketin parka li ber Navenda Kongreyê, li dorê dicivin û navroja xwe kir.

Rojek berî wê jî mamoste Mazhar qala mihrîcana zeytûnan kiribû û gotibû, 'Mamoste em bi hev re biçin Dêrikê û taweyekê bixwin.' Min jî gotibû erê.

Hîn ew roj nehatibû lê taweya Dêrikê hatibû Amedê. Mala wî ava be yê ew anîbû.

Dema ji fuarê vegeriyam û çûm Med-Derê, li wir rastî mamoste Mazhar hatim. Me ji bo dortira rojê haziriya xwe kir û em serê sibê nêzî saet 11an bi rê ketin. Ez, mamoste Mazhar û hevjîna wî Hulya bi erebeya mamoste Osman bi hev re berpêyî Dêrikê bûn. Dê hevjîna mamoste Osman jî li duryana Mêrdîn-Şemrexê tevlî me bibûya.

Di rê de li Xeyrî Demir geriyam. Ew jî hevalê min ê zindanê bû. Em li zindanên wekî Sîncan û Boluyê demek dirêj bi hev re mabûn û ew çend meh berê tehliye bûbû. Ji Dêrikê bû. Dema em bi hev re axivîn, wî got ku ew li gund e û em vexwendin gundê xwe. Navê gundê wan Reşan bû û li ser rêya me bû. Mamosteyan herêm baş nas dikir. Li ser vê me got ku em ê biçin li Reşanê bi hevalan re çayekê vexwin û paşê derbasî Dêrikê bibin.

Dema em di duryanê de berpêyî Reşanê bûn, me bala xwe da ser darên berûyê yên li qeraxê rê. Em li ber darekê sekinîn, me çend berû jê hildan û tam kirin. Em di nav gund re derbas bûn û çûn gihîştin ber sûlava çemê Reşan. Hema li binê malan bû. Hevalê Xeyrî û çend ciwanên din li wir, li benda me bûn. Li wir em di bin siya darçinaran de li ser textan rûniştin, me li gel şireşira ava sûlavê sohbet xweş kir û çaya xwe vexwar. Di wê atmosferê de tama wê çaya ku me vedixwar bi me xweştir dihat.

Berî ku em bi rê bikevin, me bi hev re çend wêne jî girtin. Me hinar û sêvên xwe jî xistin poşetekî hildan cem xwe, xatirê xwe ji wan xwest û da ser rêya Dêrikê. Lê heçko rihên me li Reşanê mabûn. Ew li wir di nav wê xwezaya xweşik de digeriyan. Dê paşê li xwe vegeriyana û bihatana bigihîştibana me.

Li duryana Mêrdîn-Şemrexê hevjîna mamoste Osman li benda me bû. Me ew jî hilda û rêya xwe domand. Em di nav Şemrexê re derbas bûn û çûn gihîştin Dêrikê. Cara yekemîn bû ku diçûm wan deran. Loma min bi baldarî li derdorê mêze dikir û derbarê herêmê de pirs ji rehberên xwe dipirsîn.

Dema em ji jor ve daketin deşta Gewr û Kufrag xuya bû, deng bi Fadilê Kufragî ket. Em bi olana dengê wî di Dêşanê re derbas bûn û bi pêş ve çûn.

**Pêşwaziya Dêrikê**

Dêrikê em bi rûkenî pêşwazî kirin. 'D'ya wê tacegulek zeytûnî dabû serê xwe, 'K'ya wê tacegulek zeytûnî… Wê du dînên xwe jî dabûn kêleka xwe û em bi kêfxweşî vexwendibûn nav xwe.

**Tacegulên zeytûnî û du dîn**

Dêrik warê zeytûnan bû û wê zeytûn kiribûn taca serê xwe. Mihrîcana Zeytûnan jî nîşaneya vê yekê bû. Lê ew du dîn kî bûn? Çima peykerên wan hatibûn çêkirin? Çima pişta wan li hev bû? Çima ewqas dişibiyan hev û çima ewqas jî cuda dixuyan? Li ser pirsên min rênîşên me dest bi vegotina çîroka wan kir. Axir hîn bûm ku ew du bira ne. Du dînên welatparêz bûne. Navê yekî Remo, yê din jî Xeto bûye. Remo tim palto li xwe dikiriye, xeto jî çakêt. Ku paltoyê Remo jî nebe, ne pêkan e ku mirov bikaribe wan ji hev derxîne. Remo û Xeto bi lihevçûna xwe, bi piştxûzî û bi wan serên xwe yên biçûk balê dikişînin ser xwe.

Em silavekê didin wan, bi wan re çend wêneyan digirin û derbasî şaredariyê dibin. Li wir çayekê vedixwin û derbasî Rengînê dibin. Mazûvanên me li wir tawe dane çêkirin ji bo me. Em di deriyekî nizm re derbasî cihê rûniştinê dibin. Ew der cihekî dîrokî bû û dişibiya hemamê. Cihekî bi qube bû.

Piştî xwarinê em dîsa çûn şaredariyê. Jin û wekîlên ku çûbûn nav bexçeyên zeytûnan vegeriyabûn û dê biçûna panelekê. Panela jinan bû. Dê mêr tevlê nebûna. Me silavek da wan, hevala Hulya û Hediye jî bi wan re şandin û me berê xwe da sûkê.

Rênîşên me qala çend cihên dîrokî yên wir kirin. Min xwest ku em biçin hin cihan bibînin. Ji ber ku pir qala wir dikirin û digotin ku ew nêzî navendê ye, min got ku ka em berê biçin kaniya Gûzê. Di rê de rênîşê me behsa Dêrika berê kir û gotû: "Berê li van derana xerzikên tiriyê hebûn. Yek ji wan jî nemaye. Berê li vir gelek ermen dijiyan. Li nav Dêrikê aş hebûn. Yek ji wan aşê mala Xemo bû. Bi êzingan dixebitî.

Li gorî ku wî got, cihê Rengînê jî berê hemama mala Xemo bûye. Dîsa behsa mala Cemîlê Xazo û kargehên wî kir.

**Kaniya Gûzê**

Em bi sohbetê re hêdî hêdî meşiyan û gihîştin ber kaniyekê. Dişibe avahiyek bêtonkirî. Du luleyên wê hene. Em daketin xwarê û bi mistan avê jê vexwar. Li kêlekê cihê tenûrê hebû. Bi hev ve ne. Navê kaniyê bi tirkî hatiye nivîsandin. Li derdorê li keskahiyekê, li darekê digerim. Ji xêncî bêtonê ti tiştî xuya nabe. Gûz an jî gûzên ku navê xwe dane wê jî xuya nabin li holê.

Li gorî tê gotin, ew kanî berê bi awayekî azad diherikiye. Bi ava wê baxçe û bostan dihatine avdan. Pêda pêda, di bin piyên bajêr de wenda bûye. Halê wê yê xwezayî xeyal dikim, bi wî rûyê wê yê wêranbûyî yê nû re rû bi rû dikim û xemgîn dibim.

Ji wir min xwe ku em biçin serdana dêrê. Lê hat gotin ku niha ew girtî ye. Kesê ku lê dinêriye çûbûye ser heqiya xwe. Yên din jî li wir nebûne û nedihat zanîn ku bê ka mifteya wir li gel kê ye. Li gorî ku dihat gotin dêrikî xweş lê xwedî derdiketine.

Li derdora kaniya Gûzê berê mehsereya triyan hebûye. Piştî tunebûna rezan ew der bûye mehsera zeytûnan. Paşê ew jî di bin piyên bajêr de maye û bûye qehwe(xane)ya Mehserê.

**Wateya navê Dêrikê**

Bi qasî wateya navê Dêrikê, wate û çîrokên cihên ên wekî Textê Qîza Qrêl û Pozikê Mencelê jî bala min kişandin ser xwe. Her ku navên wan derbas dibûn, min wate û çîroka wan ji wan dipirsî. Her carê min digot ku em nizanin. Dibe ku filan kes bizane. Li ser vê em li wan kesan geriyan. Yên ku me dîtin jî kesî nedizanî. Di vê navberê de mamoste Osman serî li Jîrikoyê Gogilê jî da. Bersiva wî tam li gorî mantika dîroknas an jî zimannasekî nijadperest bû. Wî Dêrik kiribû navê merivekî, Mazî kiribû çiya û Qîza Qrêl jî kiribû gotineke argo… Herî dawîn behsa pirtûkeke Eyup Guven kirin û gotin, dibe ku bersiva pirsên min di wê de hebe…

Li ser vê min bi rêya telefonê pirsen xwe ragihandin birêz Eyup. Li gorî ku wî ragihand; sê şîroveyên li ser navê Dêrikê hene:

*1-* Dêrik navê xwe ji dêrê hildide. Bingehek vê heye. Berê li wir gelek ermen dijiyane û dêreke ku wan ava kiriye hê jî li ser piyan e.

*2-* Dêrik wekî nav ji dirikê tê. Li gorî Guven, ew der berê cihekî pir bi dirik bûye, dirik bi demê re guheriye û bûye dêrik. 3- Tê gotin ku avakerê Dêrikê Êla Têrkiyan bûye. Têrkî bi demê re guheriye bûye Têrik/Dêrik û navê xwe daye wir.

Guven behsa xwendina qeydên serdema Osmaniyan dike û şîroveyên xwe bi wir ve gire dide. Lê ez bi xwe jî bûm şahidê hin sohbetan ku kalên dêrikî henekên xwe bi nêrînên wî dikirin. Ango hin kesan zêde bawerî bi şîroveyên wî nedianî.

Guven çîroka Pozikê Moncelê jî bi gotina Gurê Mancolê ve gire dabû. Gurê Manco wekî çîrok li herêma me jî dihat zanîn. Mezinan pê zarok ditirsandin û ew bêdeng dikirin. Ya rast ev pênaseya wî di hişê min de jî rûnenişt.

Guven ji bo Textê Qîza Qrêl jî gotibû ku ew der cihekî dîrokî ye. Bermahiyên ji serdema Romayê mayî hene li wir û tiştekî din ê taybet negotibû.

Dibe ku çîrokek wê ya mîna Axtamarê hebe. Lê ew wenda bûye, tenê wekî navekî maye. Bermahiyên ji dema Romayê mayî hene. Ew jî li benda jîrîkoyekî ne ku bê û bi nivîsandina çîrokeke nû û nûjen ji nû ve vejîne Qîza Qrêl a wenda.

Bêyî ku jê têr bibin, me gera xwe ya Dêrikê temam kir û vegeriyan Amedê. Dêrik jî hevalbendiya me kir, bi tam û xweşikiyên xwe, bi tacegulên xwe yên zeytûnî û dînên xwe… Dema em di ber Reşanê re derbas bûn, şîrîniya ava sûlava çemê Reşan em hembêz kirin. Me xatirê xwe ji axa wê ya reş xwest û rêya xwe kudand…

